Kedkaran jiyan rawestand

Li bakurê Kurdistanê û tevahiya Tirkiyeyê kedkarên di sendîkayên bi ser KESK û KOMU-SEN'ê ve de rêxistinbûyî bi mebesta zem û feqîriyê ji bo rojekê greveke mezin pêk anî. Kedkaran jiyan rawestand. Xwendekar neçûn dibistanan, li nexweşxaneyan ji bilî servîsên awarte kar nehate kirin. Li balafirgeh û garên trênan jiyan felç bû... *RÛPEL - 4*

Hêviyên azadiyê ji nû ve geş kirin

Di serdemekê de ku zilm û xiyanet wekî xencerekê di dilê gelê kurd de hatibû çikandin, PKK wekî hêviya azadiyê bişkivî. Yanî di sala 1978'an de, ango 31 sal berî niha, Partiya Karkerên Kurdistanê PKK li gundê Fîsê hate sazkirin. Bi vî rengî dîrokeke nû li rûpelên dîroka mirovahiyê û li dîroka gelê Kurdistanê zêde bû. Ev rûpeleke tijî hêvî bû, rûpela şênbûna jiyana jibîrkirî, geşbûna hêviyên azadiya gelê kurd û rûpela berxwedanê bû. Destanek hişmendî û ramana azad bû ku bi tîpên zêrîn di nava rûpelên dîrokê de hate tomarkirin... *DOSYA R.2*

'Pêşengiya şoreşa demokratîk dike'

Meclîsa Partiyê ya PKK'ê destnîşan kir ku Tevgera Azadiya Kurdistanê, di bin pêşengiya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan de, 31 salan serketin û nirxên giranbuha û dîrokî bi dest xistine û gelê kurd ji tunebûnê rizgar kiriye Meclisa Partiyê, destnîşan kir ku di nava 31 salan de, li Kurdistanê şoreşek pêk hatiye û wiha got: "Ev şoreşa watedar û dîrokî, di bin pêşengiya Ocalan de pêk hat û bi fedakarî û dilsoziya şehîd û gaziyan kete qonaxa şoreşa demokratîk." Hate ragihandin ku PKK dê rol û mîsyona xwe ya pêşengiyê bidomîne... *RÛPEL - 4*

PKK û rastiya îro

Têkoşîna li dijî dagirkeriyê nifşekî radestî nifşê din kir. Di dîroka têkoşîna di bin pêşengiya PKK'ê de, 31 sal derbas kirin. Nifşê duyemîn têkoşînê dimeşîne. Bêguman şoreş ne hêsanî ne. Erger ev şoreş li Kurdistanê be... Eger dagirkerên Kurdistanê jî tirk, ereb û fers bin... PKK, tiştên berî xwe red kirin. Hişmendiya kevin, kesayetiya kevin red kir. Pêşî, di guhertina mirov de gav avêt... *Nivîsa Medenî FERHO R.8*

ROJEV

26 Mijdar - Pêncşem2009 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 Ykr Hejmar: 14

Di roja li dijî şîdetê de rastî şîdetê hatin

Jinan li gelek bajaran di 25'ê Mijdarê de bi çalakiyên cuda şîdeta li ser jinan şermezar kirin. Lê di roja şîdeta li hemberî jinan de jin rastî şîdeta polîsan hatin

LI DIJÎ ŞÎDETÊ DAKETIN KOLANAN

Jinan kampanyaya "Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye" ku salekê dom kir bi dawî kir. Jinan li Amed, Qilaban, Êlih, Riha, Enqere, Stenbol û gelek bajar û navçeyan bi çalakiyên cur bi cur bal kişandin ser şîdetê û xwestin pêkutî, şîdet, tacîz û tecawîza li dijî jinan bi dawî bibin.

BANGA TÊKOŞÎNÊ HATE KIRIN

Jinan di çalakiyên xwe de bal kişandin ser şîdeta li dijî jinan. Meclîsa Jinan a DTP'ê daxuyand ku di 7 mehên dawî de şîdeta li hemberî jinan ji sedî hezar û 400 zêde bûye û banga têkoşîna li dijî zayendparêziya civakî kir. Her wiha li Enqereyê polîsan êrîşî jinan kirin... *RÛPEL - 7*

Tecrîda li ser Ocalan hate şermezarkirin

Li Amedê bi munasebeta şermezarkirina girankirina tecrîdê û qedexekirina parêznameyên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan meşek li dar xist. Di meşê pankartên ku li serê "Azadiya te azadiya me, nexşeriya te rotaya me, parêznameyên te perspektîfên me ne", "Kes nikare gelê kurd di nav 6 metrekareyan de bi cih bike" hatin vekirin. Serokê Rêxistina DTP'ê ya Amedê Firat Anli diyar kir ku heke bi birêz Ocalan û PKK'ê re nekevin diyalogê nikarin vê pirsgirêkê çareser bikin û wiha got: "Ger ku dilê wan û aştiyê heye, divê tecrîda li ser Birêz Ocalan bê rakirin."

Rastî şîdeta polîsan hatin

Endamên Platforma Jinê ya Enqereyê, bi armanca 25'ê Mijdarê xwestin daxuyaneykê bidin çapemeniyê û heta Kolana Yukselê bimeşin. Polîsan li ser riya jinan bariqat danîn û destûr nedan meşa jinan. Jinên ku xwestin bimeşin û di meşê de israr kirin, rastî mudaxeleya polîsan hatin.

'AKP li şûna çareseriyê tahrîk dike'

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk piştî êrîşa faşîstan a li hemberî konvoya DTP'ê anî ziman ku AKP'ê bi sûcdarkirina DTP'ê ve dev ji berlêvekirina çareseriya pirsgirêka berdide û vê êrîşê ji bo xwe dike hincet. Turk gotinên AKP'ê yên wekî 'DTP'ê piştgirî neda pêvajoya, pêşiya pêvajoyê girt' rexne kir...

NÛÇE R4



Planên ji bo Mexmûrê zêde dibin

Iraq, Amerîka û Tirkiye bi tevlibûna rayedarên başûrî ji bo valakirina Mexmûrê civînek pêk anî. Hedefa wan ew e ku heta 15'ê kanûnê kampê bidin valakirin. Her wila derket holê ku Nêçîrvan Barzanî û Erdogan li Stenbolê hatine ba hev...

NÛÇE R5

MURAT KARAYILAN:

Pirsgirêka jinan a mirovahiyê ye

Serokê Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê Murat Karayilan bi munasebeta 25'ê Mijdarê got ku têkoşîna azadiya jinan pirsgirêka mirovahiyê ye û têkoşîna azadiya mirovahiyê ye.

Karayilan daxuyand ku têkoşîna azadiya jinan ne tenê pirsgirêka azadiya jinan e û wiha got: " Ev pirsgirêka tevahî mirovahiyê ye. Ji ber ku heta jin azad nebin civak azad nabe. Bêyî azadiya jinan hêviya azadiya civakê xwe xapandin e. Li cihên ku feraseta desthilatdar a zilaman hebe, desthilatdariyên din jî dê hebin, an jî desthilatdariyên din jî dê hebin. Ji ber vê yekê jî heta ku sîstema desthilatdar a zilaman ji holê ranebe, sîstema wekhev û azad jî pêk nayê. Bêguman pirsgirêka azadiyê ne tenê pirsgirêka jinan e. Pirsgirêka azadiya zilaman jî heye. Îro zilam nikare ji xwe re bêje 'ez azad im.'"

Karayilan, diyar kir ku destpêka hemû desthilatdariyan bi kolekirina jinan dest pê kiriye û divê di serî de desthilatdariya li ser jinan ji holê bê rakirin. Karayilan bal kişand ser kampanyaya bi navê "em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye" jî û got ku kampanyaya ku jinên kurd ev salek e dane destpêkirin kampanyaya azadiyê û têkoşîna azadiyê ye. **BEHDÎNAN (ANF)**

www.arsivakurd.org

DOSYA

DESTANA VEJÎNÊ
PKK -I-

NAVENDA NÛÇEYAN

Şehîdê yekem

Rojên zor û zehmet li benda Şoreşgerên Kurdistanê bû. Ji ber ku riya ber bi azadiyê diçû, bi mirin, girtin, kuştin, îşkence û rondikên çavan hatibû rapêçan.

Destên zorbêja li ser tetîkê, xayîn ketibûn kemînê, li serê her goşeyekê celad çav li rê bûn. Lewre zêde dem derbas nabe, tevger di sala 1976'an de, yekemîn şehîdê xwe li Enqereyê dide. Li navçeya Tûzlaçayira Enqereyê, Elî Dogan Yildirim ku tevli pêvajoya sazkirina tevgerê bûbû, şehîd dikeve.

Belê şoreşgerekî ji nava komê ji bo cara yekemîn dara azadiyê bi xwîna xwe av da, wekî ku xwestibe bêje; "Heta şehîd xwînê nerijîne, dara azadiyê şîn nabe."

PARTIYA KARKERÊN KURDISTANÊ 31SAL IN JI BO NIRXÊN MIROVAHIYÊ TÊDIKOŞE

Ji bo mirovahiyê bûye rênîşandêr

Di serdemekê de ku zilm û xiyanet wekî xencerekê di dilê gelê kurd de hatibû çikandin, PKK wekî hêviya azadiyê bişkivî. Yanî di sala 1978'an de, ango 31 sal berî niha, Partiya Karkerên Kurdistanê PKK'ê li gundê Fîsê hate sazkirin.

Bi vî rengî dîrokek nû li rûpelên dîroka mirovahiyê û li dîroka gelê Kurdistanê zêde bû. Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan vê rûpela ku bi tîpên zêrîn hatiye tomarkirin, wiha şîrove dike: "PKK ku wekî temsîl û nûnerê mirovahiya serdemê, sembola jiyaneke nû, fikir û ramana azad, felsefeyeke nûjen, sekneke bi rûmet û wekî temsîla jiyana azad derkete holê, Heta ku mirovahî hebe, Heta ku jiyan berdewam be, wê PKK jî wekî stêrka geş bibiriqe û wê bala mirovahiyê bikişîne ser xwe, wê ji bo kesên ku riya xwe winda kirine, bibe rênîşandêr."

PKK'ê bi berxwedaneke dijwar, di qonaxên pir bi êş û jan de, bi kedeke mezin, bi fedakirina xwîna giranbuha ya bi dehan keç û xort, jin û zarok, kal û pîrên Kurdistanê, bi têkoşîneke bê hempa, gelê kurd ji tunebûnê anî hebûnê, ji têkçûnê rizgar kir û jiyaneke nû da gelê Kurdistanê. Ne tenê ev yek, her wisa şoreşeke demokratîk jî pêk anî.

Li çiya bi hezaran ciwanên fedayî yên azadîxwaz, li girtîgehan bi deh hezaran berxwedêr û girtiyên azadiyê, bi sedhezaran jinên ku li dijî dagirkeran li ser piyan e û li ber xwe didin.

PKK wekî yekemîn tevgera şoreşger kete nava rûpelên dîrokê ku karî pirsgirêka kurd derxe qada cîhanî û derbasî platformên navneteweyî bike. Di nava 'Hêlîna Guran' de, li qadeke wekî Rojhilata Navîn, ne karekî hêsan e ku mirov karibe 31 salên têr û tijî li ber xwe bide û ji bo azadiya xwe têbikoşe. PKK, ev bû 31sal ji bo azadiya gelê Kurdistanê têkoşîneke bê hempa dimeşîne û her ku diçe bi hêztir dibe.

Ji kesekî ber bi milyonan

Di sala 1973'yan de, Abdullah Ocalan ciwanekî 23 salî û xwendekarê zanîngehê bû. Komeke ciwan bi pêşengiya Ocalan, li nêzî Bendava Çûbûkê ku nêzî bajarê Enqereyê paytexta Tirkiyeyê ye, civînekê çêdikin.

Bi armanca çêkirina civînê, komek ciwan di nava rojê de, di bêdengiyê de, bi gavên bi xwe bawer, bi rê dikevin. Koma ku nû dihate avakirin, hêj di destpêkê de cudabûna xwe ya ji tevgerên heyî nîşan dida. Koma ciwanan di warê îdeolojîk, felsefe, fikir û raman û di warê ruh û jiyanê de nûbûn bi xwe re anîbûn. Yek ji endamên wê komê Cemîl Bayîk wiha behsa wê serdemê û behsa cudabûna nûjeniya komê dike. "…Kom ji kesên pak, temîz, fedakar, bi biryar û xwedî bîr û bawerî pêk dihat. Me pêşî sosyalîzim nîqaş kir û nas kir, paşê netewetî, têkoşîna neteweyî û pê re jî me Kurdistan nas kir."

Vegera ji Tirkiyeyê bo Kurdistanê

Kom li Enqereyê li navçeya Tûzlaçayirê li malekê civînekê çêdike. 25 kes beşdarî civînê dibin û biryara tê dayîn ku biçin Kurdistanê. Di serî de diçin herêmên Dîlok, Dêrsim, Elezîz, Riha, Batman û herêma Serhedê. Di nava koma ku vedigere Kurdistanê de, Hakî Karer, Alî Haydar Kaytan, Kemal Pîr, Mehmet Hayrî Durmûş, Cemîl Bayik û Mazlûm Dogan jî hebûn. Herêma Dêrsim û Rihayê dibin qadên ku herî zêde lê pêşketin çêdibin û bûyer diqewimin.

Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan li ser vegera yekem a ji Tirkiyeyê bo Kurdistanê wiha dibêje: "…Me li Enqereyê wekî komeke biçûk biryara xebateke îdeolojîk da. Ev biryara îdeolojîk jî li ser vê yekê bû ku; Welatê me heye, em ê vegerin welatê xwe, welatê me mêtingerî ye, em ê ji bo rizgariya welat têbikoşin. Bêyî ku em tênbûn û zeyîfbûnê bînin bîra xwe, me ev biryara dîrokî da…"

Rengê komê derdikeve holê

Dema pê davêjin sala 1975'an, di warê hejmarê de nebe jî di warê naverokê û taybetiyan de, komeke bi hêz a bingehîn çêdibe. Êdî navekî wan jî hebû. Ji wan re dihate gotin; "Şoreşgerên Kurdistanê". Hin derdoran jî, ji ber navê Abdullah Ocalan, ji wan re digotin Apocî yanî alîgirên APO. Li hin herêman jî ji wan re UKO'cî yanî Artêşa Rizgariya Neteweyî dihate gotin.

> PKK weke temsîl û nûnerê mirovahiya serdemê derket holê. Heta ku jiyan berdewam be, dê PKK jî weke stêrka geş bibiriqe û ji bo kesên ku riya xwe winda kirine re bibe rênîşandêr

Sefera bo Kurdistanê

Sala 1977'an êdî dibe saleke wisa ku li Kurdistanê bajar bi bajar, civîn têne çêkirin. Ocalan li Agirî, Qers, Dêrsim, Dep, Dîlok û li Amedê civînan pêk tîne. Ev civîn nîşan didin, êdî tevger her ku diçe, dibe tevgereke siyasî û rengekî siyasî digire.

Ocalan li ser sefera Kurdistanê wiha dibêje: "Gelek girîng bû ku fikir û tezên min ji bo Kurdistanê derxistibûn holê, derbasî saheya welat bibûna. Pêwîst bû ev fikir û raman bi gelê kurd re bibûna wekî goşt û neynûkê. Lewre em ketin Kurdistanê..."

Piştî vegera welat, dewlet jî tevgerê dişopîne. Di encamê de roja 18'ê gulana 1977'an de yek ji pêşengê Apociyan Hakî Karer dibe hedefa sîxuran. Di encama êrîşa komplogerî de Hakî Karer jiyana xwe ji dest dide û şehîd dikeve. Hakî Karer, şoreşgerê Enternasyonalîs ku Ocalan jê re digot; "Ruhê min ê veşarî", li Dîlokê bibû hedefa xayînan û şehîd ketibû…

Êdî ciwanên Apocî dibin hedefa êrîşên sîstematîk. Salekê piştî şehadeta Hakî Karer, yanî roja 19'ê gulana 1978'an vê carê li Hîlwanê Halîl Çavgûn jî bi heman rengî, bi xayînî hedef tê girtin û tê kuştin.

Halîl Çavgûn ku wekî 'Çavûş' dihate naskirin, bi awayekî aşkera hedef tê girtin û şehîd dikeve. Ev cinayet dibe bi awayekî berbiçav nîşan dide ku wê êrîşên dewletê zêdetir bibin.

Êdî pêwîst bû ku ciwanên Şoreşger ên Apocî çalakiya tolhildanê li dar bixistana û bi vî rengî hêza xwe nîşanî neyaran bidana. Hemleya Partîbûnê ku ji bo bîranîna Hakî Karer tê destpêkirin, bi çalakiyeke tolhildanê digihêje encamê.

Hîlwan - Sêwereg

PKK hêj di salên destpêkê de pêşketinên dîrokî û berbiçav bi xwe re tîne. Hema bêje ji sifrê dest pê kir û her pêngavek ku diavêt li Kurdistanê wekî cara yekem dihate qebûlkirin. Ev pêngavên dîrokî zêdetir di navbera salên 1978-1980'yî de derdikevin holê. Pêngava 27'ê mijdarê, pêkhatina Kongreya yekemîn û sazkirina PKK'ê pêngava herî bi hêz a wê serdemê ye.

Pêngaveke din jî berxwedana li Hîlwan-Sêweregê bû. Gelê kurd di kesayetiya PKK'ê de, li dijî feodalîzmê û li dijî polîtîkayên mêtingeriyê ku herî zêde li Hîlwan-Sêweregê bi pêş ketibûn, pêngava yekem ber bi şerê çekdarî ve davêjin. Ev têkoşîna yekem a şerê çekdarî, di şerê rizgariya Neteweyî de, dibe destpêka şerê rizgariya gel. Di serî de têkoşîna Halîl Çavgûn, Salih Kandal û Cûma Tak, berxwedana wan û bi dehan kadroyên şoreşger têkoşîn bi pêş dikeve.

Berxwedana Hîlwanê pêşî bandorê li Rihayê û bi giştî bandorê li hemû Kurdistanê dike. Mirov dikare bêje ku tevger bi berxwedana Hîlwanê re geş bû. Roja 30'ê tîrmeha 1979'an li gundê Kirbaşiyê bi çalakiya li dijî Bûcakan, berxwedana Sêweregê dest pê kir. Çawa ku bi berxwedana Hîlwanê partîbûn derkete holê her wisa bi berxwedana Sêweregê re jî pêngavek ber bi neteweyîbûnê ve hate avêtin.

Sal 1980...

Ewrekî reş asîmanê Kurdistanê dorpêç dike. Komek general, çend leşkerên faşîst ên bi pirpirîk, efserên sondxwarî û qesasê serê kurdan, destûra rakirina fermana kurdan digirin û roja 12'ê Îlona 1980'ê fermana xwe dixin pratîkê.

Bi derbeya faşîst a 12 îlonê re hema bêje Kurdistan, gund bi gund, tax bi tax, bajar bi bajar ji nû ve tê dagirkirin. Girtigeh tijî bûbû ji girtiyan. Armanc ev bû ku van pêşeng, milîtan û welatparêzên kurd ji hebûna wan, ji nasnameya wan û ji rastiyan wan dûr bixin. Ger ku di girtîgeha Amedê de bi ser biketana û bigihiştana armanca xwe ya qirêj, wê careke din gelê kurd nekarîba behsa hebûn û nasnameya xwe bike. Sedema pêkanînên hovane û wehşeta li girtîgeha Amedê jî ji ber vê yekê bû.

Û girtîgeha Amedê dibe cihê îşkenceya sîstematîk û cihê înkara gelê kurd. Zilma nedîtî tê kirin. Îşkenceyên xedar pêk tê. Bi kurtî di kesayetiya girtiyên li girtîgeha Amedê de, li ser navê mirovatiyê çi hebe, dixwazin ku teslîm bigirin û ji bo teslîmgirtina gelê kurd û mirovatiyê çi ji destê wan tê, teqsîr nakin... *(didome)*



Dîrok li gundê Fîsê hate nivîsîn...

Qetilkirina Hakî Karer tê wateya ku pêwîst e rêxistinbûn mayinde bibe û rê li ber partîbûnê veke. Piştî wê rojê, yanî temamiya sala 1978'an bi xebat û têkoşîneke têr û tijî derbas dibe. Li aliyê din jî li dijî pêlên şoven, komên faşîst û bingeha feodalîzma li Kurdistanê jî têkoşîneke dijwar tê meşandin…

Di encama van hemû amadekariyan de, roja 26 û 27'ê mijdarê komeke 22 kesî bi serokatiya Abdullah Ocalan li bakurê Kurdistanê, bajarê Amedê, navçeya Licê, gundê Fîsê, li mala Îsmet Zogurlu li hev dicivin û yekemîn kongreya partiyê tê lidarxistin. Bi vê kongreyê re Partiya Karkerên Kurdistanê tê sazkirin. Biryar tê dayîn ku 24 endamên pêşeng ên Apocî tevli civîna li Fîsê bibin, lê belê ji ber ku wê çaxê Mehmet Karasungur têkoşîna li Hîlwanê korodîne dike û Kemal Pîr jî ji ber ku girtî bûye, nekarîne tevli civînê bibin. Lewre Kongre bi beşdariya 22 kesan pêk tê ku ev bûn: Abdullah Ocalan, Mehmet Hayri Durmuş, Mazlûm Dogan, Seyfettin Zogurlu, Abdullah Kumral, Cemîl Bayik, Duran Kalkan, Ali Hayder Kaytan, Sakine Cansiz, Baki Karer, Kesire Yildirim, Ali Gunduz, Husên Topguder, Ali Çetiner, Abbas Goktaş, Faruk Ozdemir, Ferzende Tahaç, Mehmet Cahit Şener, Mehmet Turan, Şahin Donmez, Resul Altinok, Suphi Karakuş.

ROJEV
Zozan Basın Yayın Adına
İmtiyaz Sahibi: Eser UYANSIZ
Yazı işleri Müdürü: Mustafa AGGÜL

Yönetim Yeri: Diclekent Bulvarı
Termil Apt. Kat:3 No: 9
Kayapınar / DİYARBAKIR
İdare Tel: 0 (412) 251 38 88
Yayın (Weşan)
Tel: 0 (412) 237 48 91
Fax: 0 (412) 237 48 89
Baskı(Çap):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basin Yayın Tan. San. Tic. Ltd. Şti.,
Telsizler Mevki Beşyol mah. Akasya Sok. No:23/A Küçükçekmece / İSTANBUL
Tel:0 (212) 580 63 81
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtçılık, AŞ. İstiklal Mah. İstiklal Cad. No:44 Seyhan/ ADANA
Yaygın Süreli Yayındır

www.arsivakurdi.org

3 gorên tomarî hatin dîtin

Li sêgoşeya Darayeni, Licê û Pasûrê gorên tomarî yên nû hatin dîtin. Her wiha hin gerîlayên ku di 1996'an de di encama bombebaranê de hatine qetilkirin jî di mizgeftekê de hatine definkirin

Di sêgoşeya navçeyên Darayeni, Pasûr û Licêyê de 3 gorên tomarî ku aydî endamên PKK'ê ne hatin dîtin. Hate hînbûn ku di operasyona leşkerî ya bi navê "Atmaca" ya sala 1996'an de endamên PKK'ê jiyana xwe ji dest dabûn û bi tomarî hatibûn definkirin.

Piştî operasyona leşkerî ya bi navê "Atmaca" ya di sala 1996'an de di sêgoşeya Darayeni, Licêyê û Pasûrê pêk hat de 3 gorên endamên PKK'ê ku jiyana xwe ji dest dabûn hatin dîtin. Hate zanîn ku di gora tomarî ya gundê Hegaderê ya bi navçeya Darayeni ya Çewlîkê de Fermandarê Herêma Amedê Mahmut Gul jî heye. Li aliyê din mizgefta dema serhildana Şêx Seîd de 87 kes bi saxî tê de hatine şewitandin de jî di encama bombebaranekê de gelek PKK'iyan di vê mizgeftê de jiyana xwe ji dest daye û li wir hatine definkirin.

Gorên nû derketin

Li navçeya Darayeni ya Çewlikê, gorên tomarî yên nû derketin holê. Hate hînbûn ku li gundê Hegaderê yê bi ser navçeya Darayeni ya Çewlikê hatiye dîtîn aydî endamên PKK'ê yên di operasyona sala 1996'an ya "Atmaca" de jiyana xwe ji dest dayî ne. Hate îdiakirin ku piştî operasyonê endamên PKK'ê yên bi navê Tellî Odabaşi (Rojîn) û ya navê wê yê kod Rojda û ji Mêrdînê ye ji aliyê hevalên van ve li gund têne definkirin. Li goristana gund jî Mahmut Gul (Cemal) û hinek hevalên wan yên hejmara wan ne diyar jî di mizgefta gund de hatine veşartin.

Mizgeftê dîrok dubare kir

Her wiha di serhildana Şêx Seîd ya di sala 1925'an de dest pê kir de 87 hevalên Şêx Seîd li Gundê Hegaderê ya navçeya Darayeni di mizgefta gund li ser giliyekê hatibûn şewitandin. Ev yek wekî çîrokekê di nav gel de heta roja îroyîn hatiye gotin û gihiştiye vê rojê. Piştî 71 salan şûnde dîsa li heman gund û heman mizgeftê gelek welatî hatine qetilkirin.

Gundiyê ku nedixwest navê xwe aşkera bike diyar kir ku ji ber ku tu kes li gund nemabû PKK'î di mizgefta gund de diman û wiha got: "Ji ber ku wê demê tu kes li gund nemabû ez nizanim bûyer çawa pêk hatiye. Lê di nav gel de tê gotin gelek helîkopter û balefirên şer hatine mizgerft bombebaran kiriye." Gundiyeyî kal, yê xizmên windayiyan yên cihê gorên tomarî di kolan dîtî jî wiha got: "Hûn çima dikolin ma hûn ê çendan bibînin. Li vir hebe ancax 4-5 kes hebin. Mirov hez nake bîne bîra xwe. Cenazeyê gelekan li vî geliyê hûn dibînin man û sewalan xwarin. Piştî çend salan dema ku em vegeriyane gund li her derî hestiyên mirovan hebûn." Gundiyê kal, bersiva pirsa "li mizgeftê gor hene an ne" jî "nizanim" da û xizmên windayiyan cihê wekî goran xuya dikin dest bi kolandinê kirin. Li ser vê yekê gundiyê pîr panîk bû û kire qêrî: "Hûn çi dikin dest li wir nedin" Di encama kolandinê de gelek parçeyên naylonan derketin. Li ser vê yekê gundiyê pîr bi hêrs bû û destûr neda ku xizmên windayiyan nava mizgeftê bikolin. **AMED (DÎHA)**

Li Geverê qeza

Li navçeya Geverê ya Colemêrgê qezaya trafîkê pêk hat. Di encama qezayê de zarokekî jiyana xwe ji dest da.

Li gundê Koçeyê yê Geverê wesayîta TEDAŞ'ê ya ji bo arîzeya ceyranê çêbike çû gund, li zarokekî xist. Zarokê navê wê/î nehat zanîn li cihê bûyerê jiyana xwe ji dest da. Zarok ji bo otopsiyê rakirin Nexweşxaneya Dewletê ya Geverê. **COLEMÊRG**

Belavkarê Gunlukê binçav kirin

Belavkarê rojnameya Gunlukê yê Dêrsimê Ertan Aytekîn hate binçavkirin. Belavkarê rojnameya Gunlukê Ertan Aytekîn dema ku li navçeya Nazimiyeya Dêrsimê rojnameya heftane ya bi navê Mezopotamya belav dikir ji aliyê polîsan ve hate binaçvkirin. Sedama binçavkirina Aytekîn nehat zanîn. Hate hînbûn ku Aytekîn birine Enmiyeta Nazimiyeyê. **DÊRSIM**

Ji YDG'ê şahî

Meclîsa Ciwanên Welatparêz û Demokratîk (YDG) di çarçoveya kampanyaya "Werin Rê" de şahiya ku nêzî 2 hezar kes beşdar bibûn pêk anî. Di şahiya ciwanan ku li Îzmirê pêk hat de êrîşa li hemberî konvoya DTP'ê ya Îzmîrê û daxuyaniya Serokwezîr Erdogan a hate şermezarkirin.

YDG, di çarçoveya kampanyaya "Werin Rê" de, li Salona Dawetê ya Mumcuyê ya li taxa Kadîfekaleyê ya Îzmîrê, şahiyek pêk anî. Di şahiya ku nêzî 2 hezar kes beşdar bûn de, Parlamenterê DTP'ê yê Wanê Ozdal Uçer, Seroka DTP'a Îzmîrê Mukaddes Kubîlay û endamên saziyên sivîl amade bûn. Li salonê alên Konfederalîzma Demakratîk, postêrên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û panqartên "Jin şer bike azad dibe, azad bibe xweşik dibe û xweşik bibe tê hezkirin", "Bi mirovên azad, em dê dewletê demokratîk bikin û demokrasiyê radîqal bikin", "Em nêxşeriya Rojê slav dikin" hatin daliqandin. Ciwanên dirûşmeyên "PKK gel e, gel li vir e" berz kirin. Seroka DTP'a Îzmîrê Mukaddes Kubîlay, diyar kir ku dê bi dînamîzma ciwanan, ber bi pêşerojê ve bimeşi û êrîşa li dijî DTP'ê şermezar kir.

Piştre Parlamenterê DTP'ê yê Wanê Ozdal Uçer axafatinek kir. Uçer, ji aliyê ciwanan ve bi coşek mezin hate pêşwazîkirin. Uçer, êrîş û zixtên li dijî DTP'ê şermezar kir û da zanîn ku yên li ser xwînê siyasetê dikin dîsa dest bi kar kirine û ew dê destûra provokasyonan nedin wan. Uçer, got ku her çiqas zilma bi salan e li dijî kurdan didome jî aştî û azadî nêzîk e.

Uçer, der barê nîqaşên çareseriya pirsgirêka kurd de jî da zanîn ku ev niqaşên têne meşandin li ser pirsgirêka kurd e û wiha got: "Niha her çiqas nav lê nekin jî pirsgirêka kurd tê niqaşkirin. Di pêvajoyek wiha de êrîşek bi vî rengî ku li Îzmîrê pêk hatiye bi zanebûn û piştgiriya polîsan ve pêk hatiye." Uçer, der barê daxuyaniya Serokwezîr Erdogan a têkildarî êrîşa li hemberî konvoya DTP'ê jî nirxandin û ev tişt gotin: "Êw ampûla te ya reş çiqasî zagonî be, rengên kesk, sor, zer û gula DTP'ê jî ewqas zagonî yê. Vî gelê ji bo dirûşmeyên derzagonî û alên heyî êrîşî konvoyê nekirin. Ji ber qesta polîsên te û di encama provokasyonê de pêk hat. Divê tu daxuyaniyên rast ji vî gelê re bikî. Berpirsyarê êrişan jî AKP ye."

Uçer, axaftinên AKP'ê ya "Îmrali wekî navnîşan nîşanî me didin" bibîr xist û da zanîn ku di warê çareseriya pirsgirêka kurd de navnîşan Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan e û wiha dom kir: "Em jî dibêjin ku muhatabê vê çareseriyê Îmrali ye. Ger hûn bi rastî aşîtiyê dixwazin bi Birêz Ocalan re hevdîtinê çêkin. Kesê ku li vî welatî xwînê bi sekinîne û aşîtiyê bîne ew e. Ev gel di hilbijartinê de dê te bibersivîne. Bi salan e gel li qadan dibêje 'PKK gel e, gel li vir e. Ne em, gel vê yekê dibêjin."

Şahî piştî axaftinan bi xwendina helbest, şano û folklorê dom kir. Hunermendên NÇM'ê Koma Zerdeşt û Koma Dîyarîn derketin ser dikê û konser dan. **ÎZMÎR**

Pêkutî şermezar kirin

Ji Girtîgeha Jinan a Sîncanê bangawaziya hişyariyê

GIRTIYA Girtîgeha Jinê ya Sîncanê Ayşe Yumlî Yeter, diyar kir ku rewşa girtîgehan her ku diçe girantir dibe û xwest raya giştî li hemberî vê yekê hişyar bin.

Girtiya bi navê Ayşe Yumlî Yeter ku ji 11'ê îlona 2009'an de li Girtîgeha Jinê ya Sîncanê girtîye, bi boneya balê bikşîne ser şert û mercên girtîgehê ji Şaxa ÎHD'ê ya Enqereyê re name şand. Yeter, di nameya xwe de diyar kir ku şert û mercên girtîgehê her ku diçe giran dibin. Yeter, destnîşan kir ku ji bo her kesekî 5 pirtûkan didin wan û di her derketina revîrê de li ser wan digerin û heta li hundirê pêlavên wan digerin. Yeter di nameya xwe we diha got: "Em malzemeyê kirtasiyê dixwazin, lê gelek malzeme qedexe dikin. Li girtîgehên din ev malzeme tev serbestin, lê ev malzeme li Girtîgeha Sîncanê qetexe ne. Dema em ji bo derkevin revîrê em daxwaznameyan didin, em di heman rojê de dernakevin revîrê. Hevdîtina me dadixin 40 deqîqeyan." Yeter, anî ziman ku neçarin ji bo her pêdiviyên xwe daxwaznamen binivîsin û gelek daxwazên wan bê bersîv dimînin. Yeter, bang li rayagiştî, nivîskar, rewşenbir û parazvanên mafê mirovan kir û xwest li hemberî rewşa girtîgehê bêdeng nemînin. **ENQERE**

Mafên xwe xwestin

Serbaz SIYAMEND
Abdula RAMAZAN HEWLÊR / DÎHA

Xwendekarên navçeya Qeladizê ya bi ser Silêmaniyê, li ber avahiya Parlamentoya Herêma Federal a Kurdistanê astengiyên li dijî xwendekaran şermezar kir.

Komek xwendekarên Qeladizê yê bajarê Silêmaniyê, ku amadeyî bidawî kirine, helwesta rayedarên zanîngehê ya ku nahêlin li kolejên zaningehan bixwînin şermezar kir. Xwedenekaran li ber avahiya Parlamentoyê daxuyanî da û mafê xwe xwestin. Li ser navê xwendekaran Ehmed Teha, daxuyanî xwend û diyar kir ku naheqî li wane hatiye kirin û got: "Kur û keçên berpirsên herêmê, hêjmara wan ji me jî kêmtirin, lê li kolejên baştir hatine qebûlkirin. Herçend navê me li kolejên cur be cur jî derketiye û me hertişt temam kiriye, lê dîsa jî naheqiyê li me dikin û dibêjîn pêwiste hûn li peymangeyan diblomê bixwînin."

Xwendekarê binavê Keywan jî got: " Me serî li gelek cihan kiriye, lê tenê soz dane me. Ev 3 hefte derbas bûn lê tiştek ji mere nekirine û li parlementôyê jî tu kes nayê pêşiya me ku li Qeladizê hatîne ber perlemantoyê. Tenê em dixwazîn mafê xwe yê xwendinê bistînin."

Girtiyên li Girtîgeha Tîpa E ya Mûşê pêkutiyên li ser girtiyên li girtîgehên Tirkiye, Îran û Sûriyeyê şermezar kirin. Girtiyan li hemberî pêkanînên ne mirovî banga bihîstiyariyê kirin.

Girtiyên bi navê Yasîn Aydin û Kenan Altun li ser navê girtiyên li Girtîgeha Mûşê daxuyaniyek dan û pêkutiyên li hemberî girtiyên li girtîgehên Tirkiye, Îran û Sûriyeyê şermezar kirin. Di daxuyaniyê de hate gotin ku mafê jiyanê,mafê herî pîroz e lê li hemberî kurdan pêkanînên ne mirovî didomin. Di berdewama daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Li Rojhilata Navî di demên dawî de bi guhertina konjukturê li hemberî kurdan li Tirkiye, Îran û Sûriyeyê jî pêkanînên ne mirovî gîhişt asteke nû. Pêkutiyên li ser girtiyên van hersê welatan daxwaza tasfiyekirina Tevgera Azadiyê bi awayeke zelal nîşan dide. Devleta tirk di bin navê çareseriyê de tasfiyekirinê pêşdixe û li girtîgehan jî bi tecrîd û tedawînekirina nexweşan girtiyan terkî mirinê dike."

Di daxuyaniyê de hate gotin ku girtiyê bi navê Samet Çelîk ji ber nayê tedawikirin terkî mirinê hatiye kirin. Girtiyan darvekirina îhsan Fetahiyan ê ji dewleta Îranê jî şermezar kirin. Her wiha pêkutiyên li ser girtiyên, li girtîgehên Sûriyeyê jî bi awayeke tund hatin şermezarkirin.

Girtiyan di dawiya daxuyaniyê de banga bihistiyariyê kirin û xwestin tu kes li hemberî van pêkanînan bêdeng nemîne. **MÛŞ**

www.arsivakurdi.org

Kedkaran jiyan rawestand

Kedkaran li tevahiya Tirkiye û bakurê Kurdistanê Hikûmeta AKP'ê hişyar kir. Bi sed hezaran kedkarî duh dest nedan kar û grev pêk anî. Li Amed, Stenbol, Enqere û Îzmîrê meşên girseyî pêk anîn. Li Enqereyê polîsan mudaxeleyî meşa kedkaran kir. Kedkaran li Stenbolê Serokê CHP'ê Tekîn negirt korteja xwe

NAVENDA NÛÇEYAN – AMED

Li bakurê Kurdistanê û tevahiya Tirkiyeyê kedkarên di sendîkayên bi ser KESK û KAMU-SEN'ê ve de rêxistinbûyî bi mebesta zem û feqîriyê ji bo rojekê greveke mezin pêk anî. Li Enqereyê polîsan êrîşê konteja KESK'iyan kir. Li Stenbolê kedkaran Serokê CHP'a Stenbolê ji ber helwesta wan a têkildarî axaftina Onur Oymen negirt korteja xwe.

Kedkaran li tevahiya Tirkiye û bakurê Kurdistanê jiyan da rawestandin. Xwendekar neçûn dibistanan, li nexweşxaneyan ji bilî servîsên awarte kar nehate kirin. Li balafirgeh û garên trênan jiyan felç bû. Kedkaran greva herî mezin a salên dawî pêk anî û Hikûmeta AKP'ê protesto kir.

Greva li ser bangewaziya KESK'ê û KAMU-SEN'ê bi sedhezaran kedkaran duh grev pêk anî. Kedkarên ku neçûn ser kar li Amed, Stenbol, Îzmîr û Enqereyê daketin kolanan. Her wiha li hemû bajarên din jî daxuyaniyên çapemeniyê hatin dayîn.

Bi hezaran kes ku ji bo KESK'ê li Kolana Ziya Gokalpê civiyan û xwestin daxuyanî bidin çapameniyê, rastî mudexaleya polîsan hatin. Girseyê bi keviran bersiv da mudexaleya polîsan. Aloziya di navbera kedkaran û polîsan de demeke dirêj dom kir.

CHP jî hate protestokirin

Li Senbolê jî kedkarên ku duh di grevê de bûn meşiyan. Bi 10 hezaran kedkarên ku bi çalakiyên cur bi cur xemsariya hikûmetê ya li hemberî pirsgirêkên kedkaran protesto kir. Partiyên siyasî û saziyîn sivîl jî li tevahiya Tirkiyeyê û bakurê Kurdistanê piştgirî da greva kedkaran. Li Stenbolê Serokê CHP'ê Gursel Tekîn jî xwest tevî korteja kedkaran bimeşe. Lê kedkaran ew negirt nav xwe. Kedkaran ji ber axaftina Cîgirê Serokê Giştî yê CHP'ê Onur Oymen ku di 10'ê mijdarê de kiribû û pesindariya Qetlîama Dêrsimê kiribû, CHP protesto kir û nehişt Serokê CHP'a Stenbolê tevî kontejê bimeşe.

Li Amedê meş û daxuyanî

Di çarçoveya greva ku ji aliyê KESK û KAMU-SEN'ê ve li giştiyê Tirkiyeyê hatin lidarxistin, li Amedê jî daxuyanî hatin dayîn. Kedkarên endamên KESK û KAMU-SEN'ê li Amedê li ber Midûriyeta Perwerdehiya Neteweyî civiyan û daxuyaniyek dan çapemeniyê. Piştre girse ber bi Qada Deriyê Çiya ve meşiya û li wê jî li ser navê kedkarên KESK û KAMU-SEN'ê Yakup Keskîn daxuyaniyek da çapemeniyê. Berdevkê Platforma Demokrasiyê Edip Yaşar, Şaredarê Bajarê Mezin a Amedê Osman Baydemîr, ji Platforma Demokrasiyê Alî Oncu, Şaredarê Kayapinarê Zulkuf Karetekîn û serokê Rêxistina DTP'ê ya Amedê Firat Anli û bi sedan kedkar beşdarî çalakiyan bûn. Serokê Egîtîm Sen'a Amedê Abdullah Karahan bir avahiya Midûriyeta Perwerdahiye Neteweyî ya Amedê bi daxuyaniyeke çapemeniyê sedemê pêkanîna grevê anî ziman. Piştre girse ber bi Qada Deriyê Çiyê ve meşiya. Li qadê bi sedan kedkar li ber def û zirneyê dîlanê girtin.

Turk: AKP li hincetan digere

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk piştî êrîşa faşîstan a li hemberî konvoya DTP'ê anî ziman ku AKP'ê bi sûcdarkirina DTP'ê ve dev ji berlêvekirina çareseriya pirsgirêka berdide û vê êrîşê ji bo xwe dike hincet. Turk gotinên AKP'ê yên wekî 'DTP'ê piştgirî neda pêvajoya, pêşiya pêvajoyê girt' rexne kir û wiha got: "Berê jî me gotibû, em navbeynkar in û alî ne. Divê em her alî ve li ser pirsgirêkê rawestin. Ji ber vê yekê em dibêjin tune hesibandina PKK'ê, û Îmraliyê ve çareserî ne mimkûn e."

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk, cîgirê serokê koma DTP'ê Gultan Kişanak, parlamenter Hasîp Kaplan û Aysel Tugluk der barê êrîşa li dijî konvoya DTP'ê ya Îzmîrê daxuyanî de dan çapemeniyê. Turk anî ziman ku li balafirgehê heta qada mîtîngê di guzergeha ji aliyê Midûriyeta Ewlehiyê ve hatiye diyarkirin de çûne û di rê de rastî êrîşê hatine. Turk bilêv kir ku di rê de erebeyên ku korneyê dixin û anons dikin hişyar kiriye. Turk da zanîn ku konvoyeke bi dîsîplîn û hesas bû û di nav konvoyê de zarokên ku kincên gelêrî xwe kiribûn nîn bin tenê di qada mîtîngê de zarokên ku kincên gelêrî xwe kiribû çîçek dane wî.

Turk anî ziman ku ew roj waliyê Îzmîrê geriyaye lê walî li maçê bûye û ewlehiyê jî re gotiye ew roj li bajar 3 maç hebûna ger haya wan jê hebûya destûr nedidan tiştekî wiha. Turk diyar kir ku daxuyaniya ewlehiya Îzmîrê ku di çapemeniya tirk de derketibû ya 'Ger em li cihê bûyerê nebûna gelek mirovên bihatana kuştin' derewand û got dixwazin bûyerê kaşî cihekî din bikin.

Lîstikeke polîtîk heye

Turk bilêv kir ku gotinên hikûmetê ji tiştên ku hatine qewimîn balkêştir e û wiha got: "Hikûmet çima wê tîne rojevê ? Aşkera ye ku ji bo girtina DTP'ê hewayeke psîkolojîk diafirînin. Ev di gotinên birêz Çîçek û birêz Çelîk de xwe dide der. Dixwazin peyama DTP û MHP aloziyê derdixin em îstîkrarê pêk tînin û ger em nebin îstîkrara welat dê têk biçe bidin. Dixwazin gel hewcedarî xwe bikin û di vir de lîstikeke polîtîk heye." Turk da zanîn ku dixwazin wisa bidin xuyakirin ku li hember gelê Îzmîrê bertek nîşan dane lê gel û saziyên Îzmîrê bi daxuyaniyan ve piştgirî dana wan û ev helwest şermezar kirine.

Bersiv da Cemîl Çîçek

Turk anî ziman ku dixwazin ji raya giştî re peyama 'Girtina DTP'ê mafek e' bidin û wiha bersiv da gotinên Cemîl Çîçek ên der barê mijarê: "Berê Cemîl Çîçek digot ger hûn DTP'ê bigirin hûn ê herêmê teslîmî DTP'ê bikin. Niha jî dixwazin bi girtina DTP'ê û piştî ku DTP'ê bê girtin peyaman didin. Li vir tiştekî hesas heye. Di vir de kesên ku tenê em partiya herêmê ne sûcdar dikin naxwazin em biçin herêmên din xebatan bikin. Ji aliyekî ve rexneyên hûn partiya Tirkiyeyê nîn in me dikin ji aliyê din ve jî dema em dibêjin em partiya Tirkiyeyê ne me sûcdar dikin." Ahmet Turk di dewama daxuyaniya xwe de anî ziman ku biryara ji bo girtina DTP'ê xwediyên biryarê eleqedar dike. ENQERE

Erdîş û Qerqeliyê Komên Aştiyê hembêz kirin

Endamên Komên Çareseriya Demokratîk û Aştiyê yên bi banga Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan hatin Tirkiyeyê, li navçeyên Qerqelî û Erdîşê bi girseyî û coşeke mezin hatin pêşwazîkirin. Endamên komê, di beşdariya civînan de ji cerdevanan xwestin dest ji cerdevaniyê berdin û dawî li rijandina xwîna birayên xwe bînin.

Endamên Komên Çareseriya Demokratîk û Aştiyê Gulbahar Çîçekçî, Hamiyet Dînçer, Nurettîn Turgut û Nîzar Buldan, piştî gera navçeyên Ebex û Bêgirî, çûn navçeyên Qerqelî û Erdîşê. Endamên komên li Qerqelî û Erdîşê jî bi coşek mezin hatin pêşwazîkirin. Endamên komê di ketina navçeya Qerqeliyê ji hêla hezaran kesî ve hatin pêşwazî kirin. Kom, piştî pêşvazîkirinê li gel girseyê heta avahiya DTP'ê meşiyan. Di meşê de panqart û dovîzên "Qasidên Aştiyê yên birûmet hûn bi xêr hatin navçeya me", "Em ne siyaseta dikûje, siyaseta jiyandinê dixwazin", "Em ji bo aştî û azadiyê hezar carî hatin kuştin, êdî bes e", "Muxatabê aştiya birûmet vîna gel a siyasiye" hatin vetirin.

Piştre Berdevkê Koma Mexmurê Nurettîn Turgut jî axivî û diyar kir ku ew bi armanca piştgiriyê bidin aştiyê û dengê kurd hatine Tirkiyeyê. Turgut, xwest ji bo avakirina demokrasî û aştiyê kurd bibin yek. Turgut, bang li cerdevanan kir û wiha pê de çû: "Werin çekan berdin. Bes xwîna birayê xwe birjînin." Axaftinên komê bi dirûşmeyên "Bijî Serok Apo", "PKK gel e gel li vir e", "Ocalan" hatin birîn. Piştî, axaftinan komên aştiyê û yên pê re ber bi navçeya Erdîşê ve bi rê ketin.

Li Erdîşê girseya mezin

Endamên Komê li Garaja Erdîşê ji aliyê hezar kesî ve bi pankarta "Nêviyên berxwedêrên Zîlan, qasidên aştiyê yên KCK'ê silav dikin" hate vekirin. Girseyê di pêşwazîkirinê de gul dan endamên komê û bi konvoyek mezin çûn avahiya DTP'ê ya Erdîşê. Di meşê de panqart û dovîzên "Bila êdî ne gerîla û ne jî leşker bimirin, êdî bes e", "Ciwan rastiya xeyalan e", "Ji zîlanê heya Qendîlê hezar silav", "An em dê bi Ocalan re azad bibin, an jî em dê ji bo azadiya Ocalan bimrin", "Nêzikatiya Serok nêzikatiya aştiyê ye" hatin vekirin. Di rê de welatiyan ji bo endamên komên aştiyê bibîne derketin ser baniyan û endamên komê slav kirin. Li vir endama Koma Aştiyê Hamiyet Dînçer axaftinek kir. Dînçer, anî ziman ku Ocalan ligel tecrîda giran dîsa ji bo aştiyê têkoşînek mezin dide û bal kişand ser guherandina cihê Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan jî û wiha got: "Di pêvajoyekê ku qala aştî û demokratîkbûnê tê kirin de, mercên Brêz Ocalan girantir dikin. Bi vê yekê re dixwazin gelê kurd ceza bikin. Daxwaza me ya aştî mafê me yê herî mirovahî û xwezayî ye." WAN

'Ji bo herêmê bû hêvî'

Meclîsa Partiyê ya PKK'ê, 31'mîn salvegera damezrandina Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK), bi daxuyaniyekê pîroz kir û dilsoziya bi şehîdên têkoşîna Azadiya Kurdistanê re anî ziman.

Meclîsa Partiyê ya PKK'ê, destnîşan kir Tevgera Azadiya Kurdistanê, dibin serokatî û pêşengiya Rêber Apo de, 31 salan serketin û nirxên giranbiha û dîrokî bidestxistin e û got: "Em li hember ked û hişmendiya têgihiştîya Rêber Abo mînetdar in û Rêber Apo bi dilsozî silav dikin."

Meclîsa Partiyê, destnîşan kir ku, dibin têkoşîn û berxwedana PKK'ê de, gelê kurd ji têkçûn û windabûnê xelas bû û got: "Di qonaxa îroyîn de, PKK li çar parçeyên Kurdistanê bûye hêviya paşerojên azad û jiyana bi rûmet."

Daxuyaniya ji bo pîrozbahiyê wiha dewam kir: "Di qonaxa îroyîn de, gelê kurd, ji tunekirin û inkarê xelas bûye û wek îradeyeke siyasî derketiye holê. Yekemîn armanca PKK'ê ew bû ku, kesayetiya kurd ya teslîmgirtî, xelas bike. Ev pêk hat û gelê kurd, îro li ser lingan e û weke gelê pêşeng li herêmê derketiye meydanê."

PKK'ê, destnîşan kir ku, di nava 31 salan de, li Kurdistanê şoreşek pêkhatiye û got: "Ev şoreşa watedar û dîrokî, dibin pêşengiya Rêber Apo de pêk hat û bi fedekarî û dilsoziya şehîd û gaziyan kete qonaxa şoreşa demokratîk."

Têkoşîn didome

PKK'ê, di daxuyaniyê de, li ser rol û misyona Tevgera Azadixwaz a Gelê Kurdistanê ya li herêmê jî rawestiya û got: "Haveynê azadiyê û civaka demokratîk ji aliyê Rêber Apo ve hate avêtin û ev haveynê azadî û jiyaneke bi rûmet ya di nava gelan de girtiye. Ev haveyn, wê li herêmê bibe bingeha azadî û demokrasiyê. PKKe jî wê bi heman rol û misyona xwe têkoşîna xwe yan pêşeng bidomîne."

Meclîsa Partiyê, diyar kir ku gelê kurd jî, xwedî biryar û dilsozê bidetsxistina demokrasî, aştiyeke mayînde û jiyaneke bi rûmet e û got: "Tesfiye kirina têkoşîna gelê kurd ne mumkun e. Ji ber ku li dijî sîstema kapîtalîst a talanger, sîstema alternatîf ava kiriye. Ev sîstema alternatîf jî, KCK'ê ye û bi saya Rêber Apo û hişmendiya ku hêza xwe, ji dîroka qedîm ya 10 hezar salan distîne, tê."

PKK'ê destnîşan kir ku serketina gelê kurd rastiya Serokatiyeke rast, pêşengî û rêvebiriyeke rast e û got: "Ev çekê herî dijwar yê ku têknaçê ye. Ev hêza mezin di aliyê azadiya jinê de jî, derxistiye pêş û weke giyanê jiyeneke nû, civakeke nû derketiye holê."

Hêviya gelê kurd e

Meclîsa Partiyê herî dawî bal kişande ser dagirkerî û siyasetên tunekirinê yên Tirkiyeyê, Îran, Suriye û Iraqê û got: "Dewletên dagirker, bi hevkarên kolonyalîst re, li dijî gelê kurd û Tevgera Azadîxwaz a Gelê Kurdistanê, serî li her cure lîstikan û konployan didin. Di nava bextreşiya kevneşopiyeke kirêt û gemarî de, tunekirina gelê kurd wek hebûna xwe dibînin û siyasetên red û inkarê dimeşînin. Lê têkoşîna Tevgera Azadîxwaz a Gelê Kurd, bûye hêviya azadî û demokrasiya li herêmê."

PKKe destnîşan kir ku Tevgera Kurd, PKK'ê ji her denmê bi hêztir e û xwedî derfetên têkoşîn û berxwedaneke mezin e û got: PKKe li ser bingeha soza daye şehîdan û gelê xwe û di xeta Rêber APo de, wê serketinên, bi hêztir, ferehtir û zêdetir bidestbixwe. BEHDÎNAN (ANF)

www.arsivakurd.org

Şêniyên Kampa Penaberan a Mexmûrê di her fersendê de tînin ziman ku ew bi darê zorê hatine mişextkirin û nabe ku vegera wan jî bi darê zorê be. Penaberan li gorî şert û mercên xwe pergaleke jiyanê saz kiriye û vegera xwe di çarçoveya çareseriya pirsgirêka kurd de dinirxînin.

12 hezar penaberên ku piraniya wan ji gundên Şırnexê ne zêdetirî 16 salan e li başûrê Kurdistanê dijîn. Şêniyên kampê di nava dema borî de ji xwe re wargehek ava kiriye û şert û mercên kampê di asteke demokratîk de baş kirine.

Plana dewleta tirk a ji bo Mexmûrê!

Iraq, Amerîka û Tirkiye bi tevlibûna rayedarên başûrî ji bo valakirina Mexmûrê civînek pêk anî. Hedefa wan ew e ku heta 15'ê kanûnê kampê bidin valakirin. Her wiha derket holê ku Nêçîrvan Barzanî û Erdogan li Stenbolê hatine ba hev

Yusuf ZIYAD / HEWLÊR - ANF

Danostantinên di navbera dewleta tirk û Hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê de yên ji bo girtina Kampa Penaberan a Mexmûrê zêde bûn. Dewleta tirk dixwaze ku heta 15'ê kanûnê kampa penaberan bê girtin. Balkêş e ku çapemeniya Başûr a ku di bin kontrola Neçîrvan Barzanî de ye lez daye kampanyaya ji bo reşkirina PKK'ê û hedef nîşan dide.

12 hezar mexmûriyên disalên 1990'î de bi darê zorê koçberî başûrê Kurdistanê bûne, tê xwestin ku wekî amûrê bazara siyasî ya di navbera dewleta tirk û hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê de bêne bikaranîn. Koordînosyona Sêalî ya di çarçoveya tasfiyekirina Tevgera Azadiyê de hatiye avakirin dixwaze plana xwe ya ji bo girtina kampê bibe serî.

Biryarên civînên sêalî

Li gorî agahiyên hatine bidestxistin Iraq, Amerîka, Tirkiye û rayedarên başûrî civînek pêk anî ye. Di vê civînê de wekî hedef dane ber xwe ku heta 15'ê kanûnê kamp bê valakirin. Lê heke ev yek pêk neyê û penaberên Mexmûrê li hemberî li ber xwe bidin, pirsgirêka Mexmûrê dê ji bo piştî hilbijartinên Iraqê bê hiştin.

Di civînê de zora ku dê plana yekemîn de li ser penaberan bê meşandin di encama civîna sêalî de hatine destnîşankirin:

✓ Bi mebesta ewlehiyê dê cihê kampê bê guhertin, di vê çarçoveyê de hêza xwe rêxistinkirî ya kampê bê belavkirin,

✓ Ji bo ku xebatên koordînasyona sêalî serkeftî bibin dê piştgiriya hêzên Başûr jî bê girtin,

✓ Di nava kampê de bi pere kesên ku propagandaya vegerê bikin dê bêne bidestxistin û propaganda bê meşandin.

✓ Bi destê rêberiya kurd gav bi gav ambargoya li ser kampê dê bê zêdekirin, Li Herêma Federal a Kurdistanê riyên îstîhdamê li ber penaberan bêne girtin,

✓ Çapeminiya di bin kontrola Neçîrvan Barzanî û Yekgirtu Îslamî bi awayekî taybet dê piştgiriyê bidin projeya 'berlêvekinina çareseriya pirsgirêka kurd' a bi AKP'ê,

Ligel van biryaran xebata ji bo vegera Tirkiyeyê ya kesên ji PKK'ê reviyane û li Başûr bi cih bûne jî bê kirin.

Rola Nêçîrvan Barzanî

Li aliyê din derket holê ku Kevne Serokwezîrê Hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî demek beriya niha li Stenbolê bi Serokwezîrê Dewleta Tirk Recep Tayyîp Erdogan re hatiye ba hev. Çavdêrên siyasî tînin ziman ku polîtîkaya Hikûmeta AKP'ê ya ji bo pirsgirêka kurd, li başûrê Kurdistanê bi destê Nêçîrvan Barzanî ve tê meşandin.

Bi taybetî tê dîtin ku meyda di bin kontrola Nêçîrvan Barzanî de liv û tevgerên AKP'ê yên ji bo pirsgirêka kurd tim derdixe manşetên xwe. Çapemeniya Başûr progandaya AKP'ê dike ku 'dixwaze pirsgirêka kurd çareser bike'. Ligel vê yekê PKK jî wekî aliyê ku çareseriyê naxwaze tê nîşandan.

Mexmûrî dê derbikevin çiya

Lê noqteyeke girîng a ku Nêçîrvan Barzanî û Hikûmeta AKP'ê derî hesabên xwe dihêlin heye. Ew jî bêyî rizaya PKK'ê tu planên AKP'ê yên der barê kurdan de serkeftî nabin. Ev yek di helsengandina ji Mexmûrê bi awayekî zelal derbikeve holê.

Çavkaniyên kurd tînin ziman ku penaberên Mexmûrê yê PKK'ê tu gavan naavêjin, tu planên ku PKK di nav de nebe erê nakin. Heman derdor tînin ziman ku Hikûmeta Herêma Federal pêkan e ku zora li ser kampê zêde bike û heta dibe ku cihê kampê jî biguherînin; lê heke tiştekî bi vî rengî çêbibe de 'pir zêde zorê bidin penaberên Mexmûrê biçûk û mezin tev dê derbikevin çiya."

KAMPA PREFABRÎK:

Dewleta tirk ji xwe bawer e ku dê penaberên Mexmûrê bîne Tirkiyeyê. Bi vê mebestê li Silopiyê kampeke prefabrîk ava dike. Penaberên Mexmûrê jî tînin ziman ku şert û mercên ku îro tê de dijîn ji yên Tirkiyeyê demokratîktir in û heta pirsgirêka kurd çareser nebe, venagerin.

Bi anketan manîpûlasyon

Şîrketa Lêkolînê ya A&G, li ser 'berlêvekirina çareseriya pirsgirêka kurd' anketek pêk anî. Di encama anketê de ji sedê 56'ê gelê Tirkiyeyê bawer dike ku berlêvekirina çareseriya pirsgirêkê projeya hikûmet-dewletê ye. Ji sedî 32.4'ê projeya hikûmet-dewletê gel bawer dike nexşeriya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan li ber çavan hatiye girtin. Rasthatina aşkerakirina encamên anketê ya ji bo meşa DTP'ê ya Egeyê balkêş e.

Li gorî anketa ji aliyê Şîrketa Lêkolînê ya A&G ve hatiye çêkirin piştgiriya ji bo projeya 'berlêvekirina çareseriya pirsgirêka kurd' li gorî meha hezîrane kêm bûye. Di meha hezîranê de ji sedî 69.3'ê gel piştgiriya xwe anî bû ziman.

Şîrketa Lêkolînê li 28 bajar û 79 navçeyan ji hezar 817 kesan pirsgira 'berlêvekirina çareseriya pirsgirêka kurd' kir. Xwediyê şîrketa anketê Adil Gur anî ziman ku piştgiriya ji bo projeyê her ku diçe kêm dibe. Anket di navbera 14-16'ê mijdarê de pêk hat.

Wezîrê Karên Hundir Beşîr Atalay ku di heman demê de koordînatorê projeyê ye, beriya niha ragihandibû ku car car ew ê bi rêbazên anketan nebza gel jî gibirin. Û li gorî encaman riya xwe destnîşan bikin.

Di vê anketê de noqteya têkildarî Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan balkêş e. Û ligel ku heta niha hikûmetê di anketên didan çêkirin de rola Ocalan ji bo pêvajoyê manîpûle dikir, di vê anketê de balkêş e ku rola Ocalan hatiye pirsîn.

Rasthatina aşkerakirina vê anketê û meşa DTP'ê ya ji bo herêma Egeyê balkêş e. Ligel ku DTP di asta herî bilind de tîne ziman ku pêvajoyê çareseriya pirsgirêka kurd bêyî Ocalan û PKK'ê naçe serî, bi vê anketê peyama 'dema hûn li ser navê Ocalan û PKK'ê israr dikin, piştgiriya ji bo pêvajoyê qels dibe' hatiye dayîn. **AMED**

Ji jinên rihayî pêşniyarên çareseriyê

Nûnerên jin ên saziyên sivîl û civakî ên Rihayê, di civîna "hewildana demokratîk" de xwestin operasyon bi dawî bibin, makeqanûn bê guhertin, pergala cerdevaniyê bi dawî bibe û ji bo jinên di pêvajaya pevçûnê de rastî êrîş û tecawizê hatine xebat bêkirin.

Nûnerên jin ên saziyên sivîl û civakî li Rihayê têkildarî çareseriya demokratîk civînek pêk anîn. Di civînê de Rêvebera Şaxa ÎHD'ê Suzan Îşbîlen, Seroka MAZLUMDER'ê Meral Dervîşoglu, Rêvebera Komeleya Mala Jiyanê Dilşa Yucel û Sekretera Jinê ya Egîtîm Senê Remziye Şahîn beşdarî civînê bûn. Nûnerên jin piştî civînê ji bo çareseriya demokratîk encamnameya civînê aşkere kirin. Jinan encamname li Komeleya Jinê ya Mala Jiyanê bi daxuyaniyekê aşkere kir. Li ser navê jinan Endama Komeleya Jinê ya Mala Jiyanê Dilşa Yucel xwend. Yucel, anî ziman ku kurd her tim rastî înşence, zixt û zordariyan tên û wiha got: "Li Tirkiyeyê kurd her tim wekî 'ên din' têne dîtin. Her tim kêm têne dîtin û rastî hemû neheqiyên giran tên. Têne binçavkirin û girtin.Têne revandin û windakirin. Li Tirkiyeyê hiqûq û mafê mirovan tê binpêkirin.

Yucel, pêşniyarên ji bo çareseriya pirsgirêka kurd ev daxwaz rêz kirin:

✓ Bila operasyonên leşkerî û siyasî bên sekinandin

✓ Makeqanûna 12'ê Îlonê bê guhertin, makeqanûnek nû ya ku azadiya kes û gelan derdixe holê yeka hemdem û demokratîk bê amadekirin.

✓ Hêzên Tevgerên Taybet ji gund û bajaran bên kişandin, pergala cerdevaniyê bê rakin

✓ Bila zimanê kurdî ji dibistanên seretayî heta zanîngehan bibe zimanê perwerdehiyê. Lazime li axaftin û hînbûna kurdî li her derê azad be û di qadên çand û hunerê de bê pêşxistin û wekî mafekî xwezayî bê qebulkirin.

✓ Îşkence û pêkanînên rûmeta mirovan dişkinîn, kuştinên bêdaraz, Lijneya Tiba Edlî, lêgerina li ser mirovan, rêbazên pirsiyariyê û ji mafên parastin sûd girtin, tendûristiya girtînameyê, îfade û delîlên ku bi rêyên derhiqûqî hatin çêkirin, rewşa girtiniyê û ya di bin çavan de, tendûristî û mafên hikûmxwaran, pêkanînên li girtîgehan, darizandina memûran, divê memûrên tevlî sûcan bibin neyên parastin.

✓ Li welatê me ji bo rewşên li girtîgehan, lazime qanûna TMK'ê bi giştî bê rakirin, lêgerînên bê maf û binçavkirin bên astengkirin. Rewşa jiyana li tevahî girtîgehan, li gorî mafên mirovan bên sererastkirin. Lazime li cihên ku binpêkirnia mafên zêdeyî tên jiyîn cihên wekî girtîgeh, qerqol û hwl.. bên guhertin û ev cîh ji aliyê saziyên sivîl ve bên şopandin. Tecrîda li girtîgehan bê bi dawîkirin, mafê azad bikar anîna zimanê dayikê neyê astengkirin. Zarokên di girtîgehen de ên ku temenê wan di bin 18'an de ne, bi civakê bidin qezençkirin.

✓ Divê derbarê jinên mexdûr ên ku di demên pêvçûnan de rastî tacîz û tecavîzê hatine, de xebatên qezenckirina wan a civakê bên meşandin. **RIHA**

DTP li Enqereyê riya çareseriyê vedibêje

Xebatên DTP'ê yên ji bo parvekirina 'berlêvekirina çaresireya pirsgirêka kurd' dom dikin. DTP'ê plansaziya ji bo Enqereyê jî derxist. Di navbera 4'ê kanûn 2009 û 13'ê çileyê 2010'ê dê li Enqereyê xebat dê bêne meşandin.

DTP ji bo ku 'berlêvekirina çareseriya pirsgirêka kurd' bi gel re parve bike li Enqereyê jî dadikeve holê. Di meha kanûnê de li Enqereyê xabt tên destpêkirin. plansaziyeke ji 4'ê kanûn 2009 û 13'ê çileyê 2010'ê hate amadekirin. Li gorî plansaziya hatiye çêkirin li Keçîoren, Yenîmahalle, Sîncan, Altindag û Mamakê mal bi mal dê bê geryan û li hin saziyên sivîl civîn bêne lidarxistin. Û şahiyên ji bo aştiyê pêk bên. Hevserok û rayedarên navenda giştî yên partiyê jî dê tevli xebatên ku dê mehekê bajon, bibin.

DTP'ê ji bo 'berlêvekirina çareseriya pirsgirêka kurd' bi erênî encam bibe ev demeke daketiya kolanan û mitîng û civînan pêk tîne. **ENQERE**

www.arsivakurdi.org

Obama heyfteya bê biryar dide

Serokdewletê Amrîkayê Barack Obama diyar kir ku li dij El Qaîdeyê û mutefîkên wê şer li gor îstîkar û berjewendiyên Amerîkayê ferz e û ji ber vê jî dê biryara xwe ya ji bo şandina leşkeran ya Afganistanê jî di nav hefteya bê de aşkera bike. **WASHINGTON**

Ji bo israîliyekî hezar filistînî

Sê sal berê Hamasê leşkerê israîlî Gîlat Şalît revand. Niha li Misrirê li ser Şalît bazar tê kirin. Tê payîn ku beriya cejna Qurbanê di bedêla Şalît de Lîderê Navdar ê El Fetîhê Mervan Bargutî jî di nav de hezar fisitîniyên di destê Israîlê de serbest bên berdan. **QAHÎRE**

Ji bo qatilî 40 sal ceza tê xwestin

Tevgera Qizil Kimer di anv salên 1975-1979'an de li ser navê sosyalîstiyê bi milyonan komboçî qetil kirin û navê xwe wek tevkujên faşîst di rûpela reş a dîrokê de kola

Dozgerên dadgeha li Kamboçyayê ku Netewên Yekbûyî jî piştgiriyê didin wan, ji serokê berê yê Qizil Kimerê Kaîng Guek Eav re 40 sal ceza xwestin. Eav ji ber sûcên ku pêk anîne ji dadgehê lêborîna xwe xwest

Dozgeran di doza Kaîng Guek Eav de fikra xwe ya herî paşîn anîn ziman.

Dozger Bîll Smît diyar kir ku Kaîng Guek Eav ku bi navê kod "Rêheval Doch" jî tê zanîn, wekî berpirsyarê girtîgehekê, operasyoneke xwînî bi rê ve biriye.

Kaîng Guek Eav (67) di salên 1970'an de rêveberê girtîgeha navdar S-21 a ku li Phom Penkê ye bû.

Di girtîgeha Tuol Slengê de, di salên 1970'yan de îşkence li bi hezaran kesî hatibû kirin û hatibûn kuştin.

Tê zanîn ku di vê girtîgehê de zêdetirî 17 hezar kes bi îşkenceyên gelek giran re rû bi rû mane û bi zextan bi wan dane îtirafkirin ku li dijî rejîmê sûc pêk anîne. Piştî îtirafan jî girtiyan li herêmên ku bi navê "zeviyên mirinê" jî tên zanîn, qetil dikirin.

Tenê 3 kesên ku di girtîgeha Toul Slengê de mane û niha dijîn hene.

Tevkujî bi zanayî hatiye kirin

Li gor dozger Kaing Guek Eav mirov bi xwesteka xwe kuştiye'. Dozger Bill Smith jî derbirî ku Kaîng Guek Eav ev operasyon ji ber fermanên ku ji rayedaran girtiye nekiriye, li gorî xwestekên xwe kiriye.

Parêzerên Kaing Guek Eav hêj jî nêrînên xwe tînin ziman.

Heta niha der barê gelek berpirsyarên Qizil Kimeran de doz hatibûn vekirin lê tenê Kaîng Guek Eav sûcê xwe pejirandibû û ji dadgehê lêborîn xwestibû.

Lê belê Kaîng Guek Eav anî ziman ku heke fermanên jê re hatine dayîn pêk neanîna dê ew û malbata wî jî bihatana kuştin.

4 serokên Qizil Kimeran ku niha li Kamboçyayê dimînin jî niha li bendê ne ku bên darizandin.

Tê texmînkirin ku ev doz dê di 2011'an de dest pê bikin.

Tê texmînkirin ku di dema rêveberiya Qizil Kimerên Maohez ya di 1975 û 1979'an de zêdetirî du milyonan mirov hatine kuştin. **PHNOM PENH**

Amerîkayê peyman red kir

Amerîkayê aşkera kir ku peymana navneteweyî ya mayînan qedexe dike mohr neke.

Berdevkê Wezareta Karên Derve ya Amerîkayê Ian Kelly li ser mijarê daxuyanî da. Diyar kir ku wan peyman di ber çavan re derbas kirine. Lê dîtine ku heke peymanê mohr bikin dê nikaribin parastina neteweyî ya Amerîkayê pêk bînin.

Lê ligel ku peymanê mohr nake jî Amerîka heyetekê dişîne civîna Kolombiyayê ya ji bo mayînan. Civîn salvegera peymanê ya 10 saliyê de li Kolombiyayê tê çêkirin. Berdev Kelly hem diyar kir ku Amerîka peymana mayînan mohr nake lê aşkera kir ku Amerîkayê ji sala 1993'yan û şûn ve ji bo mayinên bejahî bên îmhakirin milyarek û 500 milyar dolar alîkarî daye. Ev jî di nav xwe de paradoksek mezin e ku Amerîka di derbarê helwesta xwe ya mayînan de dijî. **WASHINGTON**

Di dibistanan de Mîlîsên Besic

Rêveberiya Îranê biryar da ku 6 hezar milîsên faşîst ên bi navê hêza mîlîsên Besic tên naskirin ku li dibistanên seretayî navendên wan werin vekirin.

Li tevahiya Îranê li dibistanên seretayî dê navendên ku rê dide bicihkirina derdora 6 hezar ji hêzên besic ên faşist ku li wan dibistanan bi cih bibin. Dê ev navend "nirxên şoreşê" bidin hînkirin. Berpirsê çand û perwerdeyê yê Besicê Mihemed Salih Jokar da zanîn ku zarokên dibistana seretayî herî zêde dikevin bin bandora hêzên derve lewra wan ev biryar daye ku bi riya mîlîsên Besic werin parastin.

Tê ragihandin ku piştî alozîyên di hilbijartinên serokomariyê yên Îranê de derketin holê û tawambariya hikûmetê ji bo muxalefetê ku ew girêdayî hêzên derve dixebitin rê da avakirina van navendan ji bo ku wekî parêzvanê desthilatdariyê li dijî muxalefeta Îranê bixebite. Ji aliyekî din ve şirketeke nêzî parêzvanên hikûmeta û parazvanên rejîma Îranê pareke mezin hiseyên şirketa telekomunisyonê kiriye bin destê xwe da ku hem têkiliyên bi riya telefonê, hem jî ajansên nûçeyan û malperên muxalefetê kontrol bike û ji bo vê armancê beşên nû yên polîsan ava kirine. **TAHRAN**

Di KE'yê de rêjeya jinan zêde dibe

Serokê Komîsyona Ewropayê Jose Manuel Barroso diyar kir ku di dema nû de rêjeya jinan ya komîsyonê dê bibe ji 3'iyan yek.

Barroso li Strasbourgê di civîna parlamenterên Ewropayê de axivî. Di axaftinê de got ku ew dixwaze agahiyeke baş bide parlamenteran û aşkera kir ku di komîsyona nû de 9 jin cih bigire. Baroso destnîşan kir ku wan name şandine welatên endam da ku endamên jin zêdetir pêşniyar bikin.

Barroso vegot ku roja sêşemê ji 27 welatên endam ên YE'yê navên dawî yên endaman jî standine. Her wiha Barroso derbirî ku ew dixwazin peywira Komîseriya Karên Hundirîn û Dadê jî ji hev veqetînin û bikin du beş. Der barê avhewayê de jî peywirdariyeke taybet bê afirandin.

Çavkaniyên Ewropayê aşkera dikin ku dê Barroso peywirdarên komîsyonên nû di nav hefteya pêş de diyar bike. Tê payîn ku dê di nav komîsyonan de giraniya muhafazakaran zêdetir be.

Parlamentoya Ewropayê dê 11'ê çileya sala 2010'an de guh bide endaman û 1'ê sibatê de jî pêşî li wan veke da ku dest bi peywirê bike. **STRASBOURG**

Abdulxaliq Çelebî (Seyît Riza)
28.12.1971 23.11.1993

Bîranîn

Dengê awaza me
Dema gîha Cûdî
Ew rîmiya ser bedena we
Bi govenda berxwedanê re
Mîna kulîlkên berfê
Hatin jêr û rijiyan
Ketin ser Kurdistanê
Bûne şilîlxanên biharê

Li ser navê malbata wî xwîşka wî Sîdar Çelebî

'Welatên dewlemend dilsoz nîn in

Guherîna avhewayê yek pirsgirêkên mezintirîn a sedsala 21'emîn e. Derket holê pereyên ji bo vê tên berhevkirin bê ku li gor armanca vê bi kar bê winda dibe. Bi taybetî welatên dewlemend vê nelirêtiyê dikin û bi milyonan dolarê ku bo têkoşîna li dijî guherîna avhewayê hatiye kirin di hesabê welatên pêşveçûyî de tune ye.

Lê ne diyar e ku ji van pereyan çiqas dane welatên ku bi pêş ve diçin. Li gorî lêkolînekê derketiye holê ku ji bo guherîna avhewayê, Netewên Yekbûyî 2 fonên ku ji 260 milyon dolaran pêk tên veqetandiye. Lê li gorî sozên ku hatine dayîn, pêwîst bû ku ev hejmar di nav 8 salên dawî de milyarek û 600 milyon dolar bûna.

NY'ê welatên pêşveçûyî sûcdar kir

Sekreterê Giştê yê Netewên Yekbûyî Ban ki-Moon, welatên pêşveçûyî bi 'sozên ku dane nehanîtine cih' sûcdar kir

Ban Ki Moon wiha got: "Sozên ku bi cih nehatine hene. Di holê de pirsgirêkeke baweriyê heye." Sermuzakeravanê Yekîtiya Ewropayê yê berpirsyarê guherîna avhewayê Artur Runge-Metzger jî destnîşan kir ku endamên yekîtiyê sozên xwe bi cih anîne. Lê Metzger, pejirand ku di vê mijarê de ji aliyê muhasebeyê ve hin çewtî hatine kirin û diyar kir ku divê ji bûyerên borî ders bêne girtin.

Rayedarê Yekîtiya Ewropayê anî ziman ku ew pere bi peymanan, ji welatên bi pêşvçûyî re hatine şandin lê ew nikarin çavkaniyên di vî warî de aşkera bikin.

Di sala 2001'an de ji bilî endamên YE'yê Kanada, Îzlanda, Zelandaya Nû, Norwêc û Swîsre jî soz dabûn ku dê alîkariya welatên ku bi pêş ve dikevin bikin. Rayedarên van welatan jî derbirîn ku tu car niyeta wan tune ye vî pereyê soz dane tev li fona NY'ê bikin. **NEW YORK**

www.arsivakurdi.org

Êrîşî jinan kirin

ENDAMÊN Platforma Jinê ya Enqereyê ku bi armanca 25'ê Mijdarê li ber YKM'ê hatin çem hev rastî mudaxaleya polîsan hatin.

Endamên Platforma Jinê ya Enqereyê, bi armanca 25'ê Mijdarê xwestin daxuyanî bidin çapemeniyê û heta Kolana Yukselê bimeşin.

Polîsan li ser riya jinan bariqat danîn û destûr nedan meşa jinan. Jinên ku xwestin bimeşin û di meşê de israr kirin, rastî mudaxeleya polîsan hatin. Parlamentera DTP'ê Sevahîr Bayirdir jî hate cihê bûyerê. Aloziya li ber YKM'ê dema ku rojnameya me çû çapê berdewam dikir. **ENQERE**

Li her derê şîdet şermezar kirin

Jinên kurd li dijî şîdeta li hemberî jinan li kolanan bûn. Jinan li gelek deveran bi çalakiyên cur bi cur bal kişand ser şîdetê. Di çalakiyan de jinan diyar kir ku qanûnên heyî rê dide kuştinan. Her wiha hate xwestin ku şîdet û pêkutî bi dawî bibin

NAVENDA NÛÇEYAN - AMED

Li gelek bajarên Tirkiye û Kurdistanê jin kampanyaya "en ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye" ku bi dawî dibe û bi munasebeta 25'ê Mijdarê çalakiyên xwe didomînin. Jinan li Amed, Qilaban, Êlih, Riha, Enqere, Stenbol û gelek bajar û navçeyan çalakî li darx istin û bal kişandin şîdeta li hemberî jinan.

Li navçeya Qilabana Şirnexê endama Tevgera Jinan a Demokratîk û Azad (DOKH) Muzeyyen Rustemoglu di daxuyaniya 25'ê Mijdarê de got ku kampanyaya ku wan di 25'ê Mijdara 2008'an de dabûn destpêkirin bi dawî dibe. Rustemoglu bal kişand li ser şîdeta li hemberî jinan. Daxuyaniya DOKH'ê li ber avahiya DTP'a Qilabanê hate dayîn û Şaredara Qilabanê Şukran Sîncar û gelek jin beşdar bûn.

Her wiha zilaman jî piştgirî dan jinan. Di daxuyaniyê de pankart û dowîzên "namûsa me azadiya me ye", "bila daik negirîn", "jin, jiyan, azadî" hatin rakirin. Endama DOKH'ê Muzeyyen Rustemoglu ku li ser navê jinan daxuyanî da diyar kir ku ew weke jin di temeneke biçûk de têne zewicandin, mafên wan ê xebat û perwerdehiyê tê astengkirin û di nava çar diwaran de têne hepskirin. Rustemoglu got ku azadî girêdayî azadkirina kedê ye.

Piştî daxuyaniyê jinan dirûxmên "jin, jiyan, azadî", "bijî têkoşîna jinan", "bijî Serok Apo" berz kirin û piştre belav bûn.

Şîdet bi şanoyê protesto kirin

Li Stenbolê jinên endamên Komîsyona Jinên Kedkar (EKK), Jinên Demokrat ên Nû (YDK) û Tevgera Jinan a Demokratîk (DKH) bi munasebeta 25'ê Mijdarê li Meydana Galatasarayê hatin ba hev. Jin ji vir heta kolana Îmam Adnan a li cadeya Îstîklalê meşiyan. Tevlibûna zilaman a meşê balkêş bû.

Jinan di meşê de pankarta "li hemberî sîstema mijokdar a ku şîdetta li dijî jinan diafirîne têkoşîn" û "li dijî tacîz û tecawîza di bin çavan de têkoşîn" û dowîzên "em ne namûsa tu kesî rê û nabin jî" hatin rakirin. Dîsa wêneyên jinên ku di bin navê namûsê hatine qetilkirin jî hatin rakirin. Jinan di meşê de dirûşmên "şîdeta li hemberî jinan bila bi dawî bibe", "jinên kedkar têbikoşin", "jin, jiyan, azadî", "bedena me, keda me û nasnameya me ya me ye hatin berzkirin. Li ser navê komê Melek Aşik axivî. Aşik got ku xwendekara lîseyê ya bi navê B.U di meha cotmehê de dema ku li kafeyeke di kolana Îmam Ayhan de dixebitî rastî tecawizê hatiye. Ji ber vê yekê wan jî daxiyaniya xwe li vir dane. Aşik got ku keda jinan a li malê nayê dîtin lê ligel vê yekê jî jin bi her awayî rastî şîdetê tê. Aşik got ku şîdet li her derê ye. Şîdet bedena parçekirî ya Ceylan Onkol a 14 salî de, di qetilkirina Ugur Kaymaz ê 12 salî de, di qetilkirina Engîn Ceber ê bin çavan de, di bedena girtiyên nexweş ên ku roj bi roj ber bi mirinê ve diçin de, di tecrîdê de, di hewldanên sexte yên dewletê de her wiha li malê, li kolanê, li kar ango li her derê şîdet heye. Piştî daxuyaniyê li ser şîdeta di bin çavan de şanoyek hate nîşan dan. Kesên derûdorê eleqeyeke mezin nîşanî şanoyê dan.

Ji Meclîsa Jinan bangawazî

Meclîsa Jinan a DTP'ê daxuyand ku di 7 mehên dawî de şîdeta li hemberî jinan ji sedî hezar û 400 zêde bûye û banga têkoşîna li dijî zayendparêziya civakî kir.

Meclîsa Jinan a DTP'ê bi munasebeta 25'ê Mijdarê daxuyaniyeke nivîskî weşand. Di daxuyaniyê de hate gotin ku siyasetên neteweperest, mîlîtarîst û olî feraseta qatlîman di nava civakê de belav dikin. Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Di dema AKP'ê de li Tirkiyeyê rewşa jinan paş ve diçe û li cîhanê di dawiyê de 2'yemîn e. Di çarçoveya sererastkirinên ketina Yekîtiya Ewropayê de hin guhertin hatine kirin lê di pratîkê de guhertinek tuneye. Divê ev yek bê pirsyarkirin. Ji ber ku şiklî ye û ne li ser esasê guhertina feraseta civakî û siyasî ye. Li hemberî jinan û muxalefeta civakî înkar û şerek heye. Di 14'ê nîsanê de 40 hevalên me yên jin hatin girtin. Ev jî vê ferasetê baş nîşan dide." Di daxuyaniya Meclîsa Jinan a DTP'ê de hate gotin ku di dema AKP'ê de şîdeta li hemberî jinan ji serî hezar û 400 zêde bûye û wiha hate gotin:

"Di 2002'yan de 66 jin hatin qetilkirin lê di 7 mehên dawî yên 2009'an de 953 hatine qetilkirin. Ji sedî 79 jin rastî şîdeta fîzîkî tên, ji sedî 29 rastî şîdeta hestî, ji sedî 52 rastî şîdeta devkî û ji sedî 18 jî rastî şîdeta aborî tên." Meclîsa Jinan a DTP'ê li dijî zayendparêziya civakê banga têkoşîne kir. **ENQERE**

Qanûnên heyî rê li ber kuştinan vedike

ENDAMA DOKH'ê Zelal Înal, diyar kir ku di nava 7 mehên dawî de 941 jin hatine qetilkirin û wiha got: "Ji ber qanûnên heyî nayên guhertin, rê li ber kuştinê nagire û dibe sedema kuştina jinê. Em ê di rojên pêş de daxwazên xwe yên der barê mevzuata qanûnî û pêkanînan de bidin Meclîsê."

Endamên Tevgera Jinan a Demokratîk û Azad (DOKH), bi boneya 25'ê Mijdarê li ber Edliyeya Êlihê daxuyaniyî da çapameniyê. Li ser navê DOKH'ê Zelal Înal, daxuyanî xwend. Înal, diyar kir ku mafê jinê bi peymana gerdûnî tê parastin, lê ev zagon û peyman ji aliyê gerdûnê ve tê binpêkirin. Înal, da zanîn ku şîdeta gerdûnî ya li dijî jinê rastiyek e û wiha got: "Lê li erdnîgariyên ku şer didomin û pêvçûn hene, jin rastî şîdetên girantir tên." Înal, destnîşan kir ku polîtîkayên dewletê şîdeta nava malê zêdetir dibe û xwest ev polîtîka bi dawî bibin. Înal, anî ziman ku ji ber mekanîzmayên parastinê rast û dicîh de nayên bi karanîn, jin tên kuştin û wiha axivî: "Em jin, jiyan in, ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye. Ziman, nasname û çanda me qedexeye."

Înal, bal kişand ser kuştina jinan a li Tirkiyeyê û destnîşan kir ku di di nava 7 mehên dawîe de 941 jin ji ber sedemê cuda ji aliyê hevser, bira û bavên xwe hatine kuştin. Înal, da zanîn ku Dadgeha Bilind, wêrekiyê dide şîdeta nav malan û biryarên derhiqûqî dide. Înal, anî ziman ku DOKH'ê li dijî şedetê têkşînek mezin daye û bi bedelên mezin gihiştine îro. Înal wiha got: "Dîroka têkoşîna me ya berê, temînata karê pêşeroja me ye. Mekanîzmayên parastinê yên niha, ji ber baş bi cih nayên, rê li ber kuştina me a li kuçeyan vedike. Ji ber wan polîkayan zilam şîdet û mîlîtarîzmê li dijî jinê zêde dikin. Em dê daxwazên xwe yên derbarê mevzuata zagonî û pêkanînan de bidin Meclîsê."

Şîdet bê ceza ma!

Jinên KESK'î bi munasebeta 25'ê Mijdarê li Navenda Giştî ya KESK'ê daxuyaniyek dan çapemeniyê.

Di daxuyaniya Jinên KESK'î de hate gotin hemû cureyên şîdetê îdeolojîk e. Piştî ku hikûmeta AKP'ê hatiye ser kar şîdeta li hemberî jinan bê ceza maye. Di berdewama daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Ji 2002'yan heta niha kuştinên jinan ji sedî hezar û 400 zêde bûye. Ji kesên ku bersûcên bûyeran in tenê 15 kes hatine cezakirin. Ev jî dide nîşandan ku feraset çawa di nava civakê de dide jiyîn."

Jinên KESK'î di daxuyaniyê de bal kişandin li ser bûyerên tacîz, tecawîz ên di nava şer de jî û wiha hate gotin: "Em dibêjin ku şer û mîlîtarîzm desthilatdariya zilaman xurt dike. Ji ber vê yekê jî divê di demeke kurt de bi riyên demokratîk aştî pêk bê."

Di daxuyaniyê de hate gotin ku têkoşîna kedê derveyî têkoşîna azadiya jinê nîn e û wiha hate gotin: "Me weke jinên KESK'î li kargehan, li malê, li sendîkayan feraseta serdest a zilaman deşifre kir. Em li hemberî hemû şîdetan derketin. Me ji lêdanên paşa, mêr û meleyan re got na. Ji ber em jinên KESK'î li Amerîkayê jineke reşik in, li Tirkiyeyê jineke kurd in, li Îrlandayê Nîda ne, li Iraqê jineke bênasname ne, em li Bursayê jinên hatine şewitandin in, em Guldunya ne, li Licêye em Ceylan in û em Dayikên Şemiyê ne."

Divê şîdet bi dawî bibe

MAZLUMDER'a Amedê, jî daxuyanî da çapameniyê û xwest şîdeta li dijî jinê bi temamî bi dawî bibe.

Cîgira Seroka MAZLUMDER'a Amedê, Guler Ozavci, diyar kir ku pêkanînan şîdeta li dijî jinê, her roj bi rêbazek cuda tê meşandin. Ozavci, destnîşan kir ku jin him di pêvajoyên şer û him jî di yên aşîtiyê de rastî şîdetê tên. Ozavci, anî ziman ku dewletên alîgirên Peymana Mafên Mirovan in, lazime jinê û tendûristiyan wê biparêzin. Ozavci, bi lêv kir ku ji bo bi dawî kirina şîdeta li dijî jinê, tevahiya saziyên dewetê lazime peywira dikeve ser wan bicîh bînin û di feraseta "Ji bo dawîlêhatina şîdetê" polîtikayên bi baryar bên meşandin.

www.arsivdergisi.com

Medenî Ferho
medeniferho@hotmail.com

PKK û rastiya îro

Têkoşîna li dijî dagirkeriyê nifşekî radestî nifşê din kir. Di dîroka têkoşîna di bin pêşengiya PKK'ê de, 31 sal derbas kirin. Nifşê duyemîn têkoşînê dimeşîne. Bêguman şoreş ne hêsanî ne. Erger ev şoreş li Kurdistanê be... Eger dagirkerên Kurdistanê jî tirk, ereb û fers bin... Tovê waweylê ye...

Hêsa çênebû... Gelê kurd jî, erzan û hêsan negihişte vê qonaxê...

PKK, tiştên berî xwe red kirin. Hişmendiya kevin, kesayetiya kevin red kir. Pêşî, di guhertina mirov de gav avêt. Mêjiyê mirov û kesayetiya mirov kire hedef.

Mêjî û kesayetiya mirovê kurd, ya dijmin bû. Di bedena mirovê kurd de, dijminatiya li dijî xwe hebû. Pêwîst bû ev mêjî, ev kesayetî ji holê rabe. Wekî din, xelasiya ji dijmin çênabe.

Dijmin ne yek bû, ne du bû... Aliyek hêzên dagirker, aliyê din hêzên bazirgan... Aliyek erdî aliyek ezmanî bû… Kurd di tara bêjingê de difetisandin. Çerxa sîstema netew-dewletê, mirovê kurd hêrtibû. Sîstemê, her cûre zanistiya xwe kiribû nava kar û ha ha li dijî gelê kurd kar dikir. Aliyê aborî, aliyê siyasî, aliyê eskerî, aliyê burokrasî, aliyê perwerdehî... Civaka kurd kiribû nava ferên aş de, ha ha dihêrt. Di encamê de, qerebalixeke ku tenê dikare bibe berdestîk û xulam derxistibû holê... Kesên ku dixwendin jî, di nava çerxa burokrasiya nasyonalîst de dihate windakirin. Îro, di nava burokrasiya tirk de, lêkolîneke statîstîkî çêbibe, herî kêm ji sedî 60 kurd in.

Ya herî balkêş, di aliyê aborî de ye... Du bîrdozên ku civakan dikine nava rekihê, civakan bêzar û neçar dikin, dihelînin û bi navê mirina reş têne binavkirin hene. Yek: **Bîrdoza Tevnepîrkê**... Du: **Bîrdoza Dojehî**... Ev her du bîrdoz, komên xelkê dimerêsin, piştre diguvêşin û di tara bêjingê de nîvmirî berdidin. Rê li ber wan têne girtin. Çi bikin, çawa bikin, ew nikarin xwe ji neçarî û bêzariya debora rojane xelas bikin.

Kurdistan, bi mînakên ku mirov dikare bi mînakên nêzîwext jî bidê; bi gištî jiyana xwe di nava xwe de û bi pîşe û hunerê xwe pêkdianî bide. Ev mijar hûjayî lêkolînekê ye. Ji ber ku aboriya Kurdistanê xwedî taybetmendî ye. Li her bajarê Kurdistanê, herî kêm 900 dezgehên pîşeyî hebûn. Li bajarok û gundan jî, heman dezgeh hebûn. Li her bajarê Kurdistanê bedestan, qeyserî hebûn. Di encama siyasetên dagirker û bîrdozên **Dojehî** û **Tevnepîrkê**, bedestanên li bajarên Kurdistanê bûne SÛKÊ QAÇAXÊ, pîşe û dezgehên pîşesaziyê jî, yek bi yek têk çûn.

Ne Bataniyên Sêrtê, ne Kêrên Êwertê, ne Cawê Şûşê, ne Cêrên Batê, ne Libûdiya Mêrdînê, ne Zivkerî Telkariya Heskîfê, ne jî zînetî û xencerên Xirbih û Kerboran… Tenê Dilokê, Mereş hinek tişt parasitn û klirin bingeha karsaziya moder. Mêrdinê nanê peksîşmet û leblebî parastin… Pîşeyên bê hejmar teva ji holê hilatin. Bîrdoza Gandî, ku wek palik û payendeka karsaziyên mezin û wek çerxa debora malbatan pêkdihat têk çûn. Kes nikarê vê têkçûnê bi demê ve, bi heyamê ve û bi pêşketina teknolojî ve girêbide. Ji ber ku li welatên herî pêşketî yên Ewropa jî, ew kar û pîşeyên wek palik û payendek hîna jî kar dikin. Xaleke din ya giring, xiyanet... Feodalîteya bi destê dewletê dihate xwedî kirin hebû. Ew j bi saya têkoşîna dibin pêşengiya PKKê de, hêdî hêdî têk diçe.

Feodalîteya ketî, ku nirxên civaka kurd, tore û nirxên civaka kurd, wek merş, ber û xalîçeyên sor li ber lingê berjewendiyên biçûk diraxist... Ji bo hegemonya û erka xwe, xak, nasname kesayetî, nirx, ziman, çand teva difirotin.

Asimilasyon... ku serokwezîrê Tirkiyê Tayyip Erdogan, bi zarê xwe yê wek mar, li Almanya got, 'sûcê mirovaniyê ye', gelê kurd heland... Piraniya kurdan, zimanê tirkî wek çînê serdest û burjuwa erê kiribûn. Vê yekê, ji aliyekî ve kesayetiya kurd dikuşt, ji aliyê din ve, kurdîtî biçûk dikir.

PKK, di demeke wiha de derkete holê. Di demeke wiha şikestî, tirsa mezin, têkçûna mezin, helandina mezin, şikestina mezin de... Ew salên ku, li bajarekî çend lib, li bajarokan yek lib, mirovên kurdên wek kurd hebûn.... Civak di nava termisandineke "weytî" de dimelîsî û bi xwe de heshisî...

Îcar îro, piştî 31 salên dijwar ku nifşekî, çeka xwe radestî nifşê duyemîn kir, li wan bajar û bajarokan bi deh hezaran kurdên kurd, derdikevin kolan û meydanan hene. Sazî û dezgehen neteweyî, ku wek hêza dewletî têne bi nav kirin haitne avakirin.

Ev navê serketina PKKê ye... Mirov dikare bêje ku, PKKe jî, ji gelê kurd hêza xwe distand. Rast e!... Gelo Lenîn, desteka gelê Rusya ne girtibane, wî dikaribe Şoreşa Octobr çêbike? Gelo Şoreşa Frensa û 5 navên; Marat, Robespierre, Saint Just, Babeuf, Danton pêşengî ne kiribane, dikarîbû serbikevê? Di Şoreşa kurd de jî, pêwiste mafê Abdullah Ocalan jî, mafê PKK'ê jî, mafê pêşengên PKK'ê jî werin dayin.

Eger NUH, kêştî çênekiribane, gelo mirovahî wî ji tofana mezin xelas bibe?

Dewlet navê zorê ye û ji bo zora xwe jî meşrû bike, kanunan çûdike. PKK, pêşî kanunên dewleta tirk red kirin. Got; rewşa kurdan, esareta kurdan, hêdî hêdî helandina kurdan, sûcê dewletê, sûcê dewletên dagirker e. Sûcdar ne gelê kurd e... PKK, dewletên dagirker gunehkar dîtin û dest bi têkoşînê kir. PKK, lewazî, bêzarî, neçarî û feqîrî destînî nedît û erê nekir.

Piştî 31 salên dijwar, pirsgirêka kurd ketibe rojeva cîhanê û li ser çareseriya pirsgirêka kurd nîqaşan dest pê kiribe jî, hîna karê PKK'ê xelas nebûye. Desthilatdariya AKP'ê, di bin navê "vekirinê"de, yek armanc daye pêşiya xwe, tesfiye kirina PKK'ê... Gelek kurdên ketî, cawê pîs, têne lîstika AKP'ê jî.

Serokwezîr Erdogan xatibekî baş e... Lê her xatib, derûvanekî baş e jî... Çîçero jî, derûvan bû... Erdogan jî... Dibin gotinên xweşik, delal û wek şelîpan li pey hev, di nava rêkûpêkiyeke ku dest, mînîk jî destekê distînê de, mirovên li pêşberî xwe dixapînin.

Lewra, di 31'mîn savgera damezrandina PKK'ê de, barê PKK'ê û barê gelê kurd bêhtirîn giran bûye...

Tenê nivîskar dikarin vî barî hinekî sivik bikin. Ji ber ku pêvajoya îro, hinekî şerê gotinê û îradê ye... Eger nivîskar, bi dilsozî nêzîk bibin û hinek 'meşaketan' bidin pêşiya xwe, dikarin li dijî dijmin pêşengiya gel bikin, rê û şivîleyan nîşan bidin, şiyar bikin; li hundir jî, ji bo palevaniya Yekîtiya Neteweyî karekî ciddî bikin û roleke dîrokî bilîzin.

Ev suxre bendeyî nivîskaran e...

Nameya Ferzad Kemanger ku cezayê îdamê lê hatiye birîn ji bo şîna şehadeta Êhsan Fetahiyan...

Li ser sêdara îdamê

FERZAD KEMANGER*

Ciwanê kurd Êhsan Fetahiyan ji aliyê Îranê bi îdiaya endamê PAJK'ê ye hate darvekirin. Hevalê Êhsan Fetahiyan ji girtîgaha Êvîn nameyek ji bo şîna Êhsan Fetahiyan nivîsand

Çalakvanê sivîl û mamostayê mehkûmbûyî bi îdamê Ferzad Kemanger ji girtîgeha Êvîn dest bi nivîsandina nameyekê ji bo şîna şehadeta çalakvanê siyasî "Êhsan Fetahiyan" kiriye ku naveroka wê nameyê wiha ye:

"Her şev stêrkekê ber bijêr dikişînin
Û ew esman pir e ji stêrkan

Silav heval, çawa te bînim ber çavên xwe? Bi çi tawanekê te bînim ber çavan? Ciwanekî zeîf li ser sêdareya îdamê ku bi hilhatina kulîlkên (tîrêjên) rojê dikene? An zarokekî pêxas ji taxa jêrîna bajêr ku dixwest ji bo sifreya betal a gelê xwe mizgîna înana nan be.

Çawa te bînim ber çavan? Ciwanek ji cinsê tamkerên azadiyê, ji taxa jurîna bajêr ku alfabêya zehmet û mezlûmiyetê dersa mekteb û xwendingeha jiyana wan e. Bi rastî min ji bîr kiribû ku di bajarê min û te de, jêr û jor û serî tuneye, çar kenarên wê zehmetî û êş in.

Dixwazim di xeyalên xwe de te bînim pêş çavên xwe, di koma " Siyamend" de ku cilên bûkiniyê li xwe kirine da biçe xenêrêja bûka azadiyê. Çawa? Çawa te bînim pêş çavên xwe? Bi cil û bergê ciwanekî, ku riya Şahoyê(1) girtiyê pêşberî xwe, da ji hundirê daristanên şewitiyên berûya bigehîje karwanekê ku rêwitiya wan ber bi welatê rojê ye?

Lê yek ji wan tiştên ku min got tawan nîn e, lê dizanim "parçeyek ji wî gelîbûn pir tal e, û bazdana ji wê yekê namerdiye"...(2)

Û bersiva te li hember bazdan û namerdiyê "NE" bû, ji bo ku serfiraz bimînî, te berê xwe da sêdarê.

Heval bi aramî razê...

Ku mirina stêrkan mizgîna hilhatina rojê ye û şiroveya xewna sêdareyan, ku her şev li welatê me xewna mirinê dibîne, ji dayikbûna zarokekê ye ku li qontara çiyayê Zagrosan ji bo serhildan û isyanê ji dayik dibe.

Bi aramî û xerîbî laşê xwe bispêre xewê, paşila axê ji bo paşerojên şînahî û herikînê maç bike.

Bê layelayên dayika xwe, bê xatirxwestin ji xwîşk û bê hêsirên babê xwe, li xaka welatekê de ku çendîn Ibrahîm, Nadir û Kiyumersan bi emanet di paşila xwe de helgirtiye, aram be.

Tenê bêje heval...bêje dixwazim bibihîzim, dema ku dengê pê û êşê tevlihev bû çi li ser zarê te bû?

Dixwazim hîn bibim, kîjan şiîr, kîjan sirûd, kîjan awaz û kîjan navî bînim ziman da çokên min nelerizin.

Bêje dixwazim bizanim, da dema ku li paş xwe dinêrim, dilê min nelerize...

Riya te vekirî be heval.

**Girtîgeha Êvîn*
TÊBÎNÎ:
1. Armanc çiyayê Şahoye.
2. Gotineka rêzdar Abdullah Ocalan.
Wergerandin ji Farisî: Dêrsim OREMAR

HESEN HUSEYÎN DENÎZ*

Pisîk ser pîsiya xwe dinixumîne!

Dewleta Tirkiyeyê dema li gundê Zanqirt a Şermexê qirkirina cerdewanan pêk hat, xwest xwe bê guneh diyar bike û tawanê biavêje ser aliyê kurdan. Cerdewanên kiryarên bûyerê û malbatên wan, destpêkê li wê derê hilgirt bin ewlekariyê û niha jî wana li Kirşehîrê bi cih dike. Bê guman ger dewletê bi destê xwe rê li ber mexdûriyeta wana venekiribaya, wiha ew nediparast û li wana xwedî dernediket. Ji vê yekê jî diyar dibe ku dewleta Tirkiyeyê li hemberî kurdan, mafê kurdan û têkoşîna kurdan di nava hewldanên qirêj û gemarî de ye. Tu carî niyeta dewletê bi aliyê kurdan ve pak û zelal nebûye. Her gav li dek, dolab û fesadiyan geriyaye. Her dem gerandina xiyanetê ya li ser serê kurdan, ji xwe re bingeh girtiye.

Di salên 1990'î de çawa ku bi sazkirin û destekdayîna Hizbûlkontrayê qirkirina bi hezaran pêşengên kurd pêk anî û bi vê yekê pêşî li ber pêkhatina şoreşa kurd girt, di roja me de jî bi rêk û rêbazên hîn ziravtir û dijwartir dixwaze pêşî li ber encamgirtina têkoşîna kurd bigre. Ji bo vê yekê, ji kuştina zarokan bigir heta ya kurdên çalak, ji girtina kesên serhildêr bigir heta endamên DTP'ê, kê li ber xwe têkoşer bibîne, bi awayekî cuda bêbandor dike.

Li kêleka vê yekê roj bi roj sedema dîlgirtina rêbertiya gelê kurd jî aşkere dibe. Destpêkê wiha dihat hesibandin ku rêvebertiya Amerîkayê, bi sedema çareserkirina pirsgirêka kurd ew dîl girt û radestî Tirkiyeyê kir. Lê di roja me de derdikeve holê ku ev ne rast e. Bi dîlgirtina rêbertiya kurd xwestin ku di sala 1981-82'an de li zîndanê tişta bi serê kadro û mîlîtanên PKK'ê bikin, di roja me de bi serê rêbertiyê bînin. Li zîndana Amedê di dema cûntaya leşkerî ya 12'ê Îlonê de, dewleta tirk dixwest bi kadroyên PKK'ê teslîmbûn û îxanetê bide pejirandin û kurditiyê di wir de bitemirîne. Her çiqasî dewlet bi ser neketibe jî, diyar e dev ji vê xeyala xwe bernedaye. Bi dîlgirtina rêbertiyê jî xwestiye ku li zîndana Îmraliyê vî karî pêk bîne. Hemû hewldan û nêzîkatiyên dewletê yên li rêbertiyê, vê şanî dide. Ev deh sal in di hucreyeke teng de bi her awayî bi ser de çûn, lê teslîmiyet nikarîbûn bimeşandana. Niha tê dîtin ku bi guhertina cihekî ji yê berê xerabtir dixwazin çepera heye lê tengtir bikin. Ev jî niyetxerabiya dewletê diyar dike.

Ger dewleta Tirkiyeyê û hevkarê wê Amerîkayê bixwestana pirsgirêka kurd çareser bikin, di van deh salan de bi dehê caran dikarîbûn çareser bikrana. Niyeta wan ne çareserkirin, lê belê tasfiyekirin e. Ji bo wê jî her bi pey dek û dolaban de ne. Dema ev dek û dolabên dewletê derdikevin ber tavê jî, wekî pisîkê, bi lez ser pîsiya xwe dinixumîne. Ev polîtîkaya ku bi navê `açilim`ê dane destpêkirin jî ji nixumandina ser pîsiya xwe zêdetir ne tiştek e. Qilifekî tasfiyekirinê ye. Her çiqasî rasterast jî dibêjin ku dixwazin tasfiye bikin, lê wekî jahra di hundirê tasa bi hingiv seyandî de, dixwazin bi şêrînahiya `açilimê` talbûna wê binixumînin. Di bin navê baştirînkirina derfetên Îmraliyê de jî tê dîtin ku dixwazin ser sipartina teslîmgirtinê bi vê yekê binixumînin. Ji bo ku bertekiya têkoşerên azadiyê jî tundtir nebe, di binî re qasidan dişînin û dibêjin, `em dixwazin gavan biavêjin, lê hûn dibînin ku CHP û MHP nahêlin`.

Lê tev derew in û parçeyekî ji senaryoya tasfiyekirinê ye. Ji xwe ev lîsk a dewletê bi xwe ye. Kî hikûmet be ew pêwîst e vê polîtîkayê pêk bîne. Li Tirkiyeyê dewlet bi hêz e; çi erkê bide ber hikûmetê, çi bide ber mûxalefetê divê pêk bînin û him jî pir bi dil û can pêk bînin. Niha tişta Erdogan jî, Baykal û Bahçelî jî û çapemeniya tirk jî dikin ev e.

Derveyî vê tiştek nîn e. Ev hikûmet, ev mûxalefet û ev dewlet pirsgirêka kurd çareser nakin. Divê kurd xwe ji vê xeyalê dûr bixin. Tişta pirsgirêka kurd çareser bike, têkoşîna gelê kurd bi xwe ye. Gel çiqasî rêxistiniya xwe li pêş bixe, çiqasî têkoşîna xwe bilind bike, çiqasî ewlekariya xwe li hemberî kiryarên xafiltî yên dewletê bistîne, çiqasî li nasname, çand, ziman û nirxên netewî xwedî derkeve ew qasî wê xwe nêzî çareseriya pirsgirêkê bike. Gelê kurd dawiya dawî divê xwe ji serhildaneke mezin a topyekun re amade bike. Ji bo vê gelê kurd him bi rêxistinî, him jî bi çek divê parastina xwe li pêş bixe. Her maleke welatparêz divê xwediyê çekekê be ku roja dewletê xwest wekî Dêrsim, Koçgirî, Agirî, Zîlan bi serê wê de bîne, bikaribe xwe biparêze, li ber xwe bide. Ev roj li pêşiya gelê kurd e û gelê kurd divê vê carê xafil neyê girtin; hişyar be, amade be ku bikaribe di vê serhildana xwe de ne têkçûnê, serkeftinê bi dest bixe. Û di vê pêvajoyê tevî de jî divê qasî misqalekê jî baweriya xwe bi dewleta tirk û tirkitiyê neyne. Li hemberî dek û dolabên wê hişyar be. Bi xwe, têkoşîna xwe, rêbertiya xwe û hêzên xwe bawer be û ji serkeftinê bêhtir rê nede tiştekî. Wê demê dewlet çiqasî bixwaze ser pîsiya xwe binuximîne jî, wê têkoşîna gel vê yekê aşkere bike û vala derxîne.

Divê were zanîn ku pirsgirêka kurd bi `açilim`ê û azadiya rêbertiyê jî bi `cihguhertin`ê nayê. Divê rêberê kurd azad were berdan û nasnameya kurd jî fermî were pejirandin. Derveyî vê her tişt dek û dolab e.

**Navenda Lêkolînên Stratejîk a Kurdistanê*

www.arsivakurdi.org

Li Başûr kovarên nû derketin

Bazara rojname û kovaran û derketina yên nû li başûrê Kurdistanê di rewacê de ye. Kovara bi navê 'Fîlm' kovareke nû ye ku naveroka wê bes bo fîlm û sînemayê terxan kiriye. Azad Sewze xwediyê îmtiyazê yê vê kovarê ye û kovara ku dê di van nêzîkan de derbikeve ya yekê ye ji aliyê naveroka xwe ve. Li gorî nûçeya kulturnameyê kovareke din ya nû jî ya bi navê 'Start Kurdistan' ku naveroka wê li ser teknolojiyê, kompûter û înternetê ye derket. Hejmara yekê ya kovara mehane Start Kurdistan ji 48 rûpelan pêk hatiye. Xwediyê îmtiyaza kovarê Perwîn Ebdilezîz Salih e û sernivîskarê wê jî Reqîb Mehmûd Ehmed e. **HEWLÊR**

'Têkoşîn'a baveki têkoşer

Mehmet Kurhan ku bi salan e di girtîgehê de ye hestên xwe bi helbestan anîn ziman û Kurhan ji bo pirtûkê wiha dibêje; 'têkoşîn; çendî parçeyek ji jiyana min be, hin jî parçeyek ji kezeba min e



NAVENDA NÛÇEYAN

Girtiyê bi navê H. Mehmet Kurhan ku di girtîgeha Sêrtê de dimîne û cezayê muebetê xwariye ji bo hestên xwe yên li hemberî keça wî ya bi navê Hediye û kurê wî Îbrahîm ku di nav refên tevgera azadiya kurdan de jiyana xwe ji dest dane û ji bo bîranîna hemû kesên di vê riyê de jiyana xwe ji dest dane pirtûka helbestan ya bi navê 'Têkoşîn' weşand.

Pirtûka helbestan 'Têkoşîn' a H. Mehmet Kurhan ji weşanên Hawarê ku saziyeke girêdayî weşanên Aramê ye hat çapkirin. Edîtoriya pirtûkê ji aliyê nivîskar Omer Dilsoz pêk hatiye. Pirtûk ji 108 rûpelan pêk tê.

Mirina hevalekî wî bandoreke mezin li ser wî dike û yekem helbesta xwe ji bo bîranîna wî hevalê xwe dinivîse. Helbesta duyem dema dibihîze kurê wî Îbrahîm Kurhan tevî refên gerîla dibe dinivîse. Kurhan di pêşgotina pirtûka xwe ya helbestan de ji bo nivîsandina helbestan wiha dibêje: "Bi awayekî pisporî dest bi helbestê nekir. Heta nayê bîra min ku min biryar girt 'wa ye ez dest bi helbestê bikim' jî lê hestên kûr ên ku ji êş û azarên dîtiye diherikin jixweber helbest bi min da nivîsandin."

Mehmet Kurhan dibêje piştî şehadeta her du zarokên xwe Îbrahîm û Hediye Kurhan dikeve nava hest û ramanên cuda û wiha pê de diçe: "Bi taybetî ji şehadeta hevala Têkoşîn (Hediye) êdî karekî wisa li ser min ferz kir. Helbet li cem min tu ferq di navbera şehîdan de tuneye. Her ku xeberek şehîdekê tê parçeyek ji ruh û bedena min jî bi xwe re dibe."

Kurhan hem li hemberî şehadeta zarokên xwe û hem jî li hember şehîdên kurd û Kurdistanê xwe mecbûr hîs dike ku helbestên xwe berhev bike û wan wekî pirtûkekê çap bike. Kurhan dibêje ev pirtûk ji bo bîranîna keça wî Hediye û kurê wî Îbrahîm diyariyeke biçûk e û wiha dibêje: "Ev pirtûk ji bo leheng û qehremaniya hemû şehîd û pakrewanên tevgera azadiyê ye. Belkî ne layiqî wan be jî, lê di mercên niha ku ez tê de me, tu tiştekî min ji vê bi nirxtir ku ez diyarî wan bikim tune ye. Xwezî hebûya. Bi hêviya ku bigihîjim vê armancê ez vê pirtûkê diyarî hemû şehîdên nemir ên kurd û Kurdistanê dikim."

Hêmaya 'Têkoşîn'

Korhan ji bo navê pirtûkê wiha dibêje: "Têkoşîn; ev têgeh hem navê vê berhemê ye û hem navê şoreşgerî yê keça min Hediyê ye. Hem jî felsefeya jiyana min e. Bi qasî ku min xwe nas kiriye li hember zilm û zordariyê derketime... Têkoşîn çiqas parçeyek ji jiyana min be ew qas jî parçeyek kezeba min e. Û ezîza pir bi nirx a li ber dilê min e."

Jiyaneke têkoşer

H. Mehmet Korhan di sala 1954'an de li Herekolê ji dayik bûye. Malbata wî koçer in. Bavê 7 zarokan e û keç û kurekî wî di têkoşîna azadiya gelê kurd de jiyana xwe ji dest dane. Korhan ji salên 1970'î heta niha bi hestên welatparêziyê têkoşiyaye. Gelek caran hatiye binçavkirin û di salên 1990'î de bi awayekî çalak di nav xebatên partiyên kurd, Komeleya Mafê Mirovan û şaredariya Sêrtê de cih girtiye û xebitiye. Helbestvan H. Mehmet Korhan di sala 1992'yan de tê girtin cezayê muebetê ji bo wî tê dayîn û hê jî di girtîgeha Sêrtê de ye.

Bi hezaran kes Facebooka kurdî dixwazin

17 hezar endamên Facebookê bi kampanyayekê Facebooka Kurdî dixwazin. Kampanya Facebooka Kurdî bi tesadûfekê dest pê kir. Nivîskar Rêzan Tovjîn, ku dît di Facebookê de beşek heye mirov dikare pirtûkan lê zêde bike, wekî mînak cara yekem pirtûkek kurdî bi cih kir. Lê rêveberiya tirkî ya Facebookê ji ber ku pirtûk bi kurdî bû, pirtûka bi navê "Dema Ku Masî Tî Dibin" a Helîm Yûsif ji wê beşa Facebookê avêt. Li ser vê yekê wekî helwestekê kampanya Facebooka Kurdî dest pê kir. Kampanya niha bi 17 hezar û 45 endaman didome.

Li gorî texmînan rojê nêzî yek milyon kurd dikevin Facebookê. Lê ji ber ku di nav zimanên Facebookê de kurdî tune ye, hemû kurd zimanên biyanî bi kar tînin. Ev jî dibe sedema asîmîlasyonê. Heke Facebooka Kurdî hebe, belkî berevajî bandorekê li ser endamên kurd bike.

Koma bi navê "Em Facebooka Bi Kurdî Dixwazin" bi armanca ku dengê xwe çêtir derxe, navê xwe guhart. Navê komê êdî hem bi kurdî hem bi îngilîzî ye: Em Facebooka Kurdî Dixwazin | We Want Kurdish Facebook.

Endamên komê van her sê lînkên jêrîn ditikînin û ji rêveberên Facebookê dixwazin ku demek berî demekê kurdî lê were zêdekirin. Heke Facebook qebûl bike ku zimanê kurdî li Facebookê zêde bibe, hingê Facebook dê komekê ava bike û wergera kurdî bi wê komê bide kirin. **AMED** *(amidakurd)*

'Laz Kapîtal' li Amedê bû

Endamên Nûnertiya Egîtîm Sen'ê li navçeya Bismilê stand-upa bi navê "Laz Kapîtal" temaşe kir.

Li navçeya Bismilê ya Amedê, Nûnertiya Egîtîm Sen'ê ya Bismilê, beriya grevê ji bo endamên xwe stand-upa Haldun Açiksozlu ya bi navê "Laz Marks" a ji pirtûka Yilmaz Okumuş a "Laz Kapîtal" li Loqala Egîtîm Sen'ê da temaşekirin. Ji bilî mamostayan, Cîgira Şaredara Bismilê Ayşe Avşar, Nûnerê Egîtîm Sen'ê yê Bismilê Yavuz Şîmşek û rêveberên Rêxistina DTP'ê yên navçeyê jî beşdarî bernameyê bûn. Di lîstikê de pergala kapîtalîst bi zimanê lazkî hate şîrovekirin û rastî eleqeyeke mezin hat. **AMED**

Googleyê dest avêt xezîneyên Mezopotamyayê

Motora lêgerînê ya înternetê Google biryar da ku piştî muzîk, pirtûk û vîdeoyan xezîneyên Muzeya Netewî ya Bexdayê yên Mezotamyayê bikin dîjîtal û li ser înternetê parve bikin. Google plan dike ku heta serê sala 2010'an 14 hezar wêneyên antîqe li ser înternetê bigihîne kesên malperê dişopînin.

Xwediyê Googleyê Eric Schmidt Bexda ziyaret kir, 3 rojan li wir ma û ji bo projeyê wiha got: "Mîsyona Googleyê ya cîhanê ew e ku agahiyan ragihîne hemû kesan." Schmidt diyar kir ku niha li ser projeyekê dixebitin û wiha pê de çû: "14 hezar wêneyên ku me kişandine û bi hin surprîzên din em ê heta serê salê biqedînin û amade bikin. Schmidt da zanîn ku dê bi alîkariya hikûmet û gelê Iraqê muzeya dîrokî ji bo hemû cîhanê parve bikin.

Lêçûnên projeyê nehatin diyarkirin lê hat ragihandin ku lêçûnên projeyê dê ji aliyê Google û Wezareta Karê Derve ya Amerîkayê ve bê finansekirin.

Muzeya Bexdeyê piştî dagirkeriya Amerîkayê piştî talana 6 salan di meha sibatê de deriyên xwe vekirîbûn. Li gorî wezîrê Turîzm û Antîqeyê Kahtan El Cuburî 15 hezar berhemên dîrokî ku ji bo wan buha nayê diyarkirin hatiye dizîn lê 6 hezar berhem ji destê dizan girtine. Di muzeyê de bi taybetî jî berhemên dewletên dergûşa şaristaniyê yên wekî; Sumer, Akad, Babîl û Asûrê cih digirin. Her wiha di vê muzeyê de koleksiyonên antîqe yên Mezopotamyayê yên herî girîng cih digirin. Xwediyê Googleyê bang kir ku ji bilî şîrketên petrolê şîrketên din jî li Iraqê kar bikin. **BEXDA**

Omer Dilsoz
omerdilsoz@yahoo.com

Rawesta li ser çûyînê

Ji hingame û kêşmekêşa jiyanê bi dûr, di van rojên cejna Heciyan de, li ber rehma zivistanê dixwazim bi we re bi pey hin pirs û pirsyarên jiyanê bikevim.

Ji kerema xwe, li cihekî talde rûnin, heke mimkûn be pala xwe vedin û niha jî hêdî hêdî qepaxên çavên xwe deynin ser hev. Em ê bêhneke dîtir bi hev re berê xwe bidin deverekê û di hişê xwe de li hin dîmenan temaşe bikin.

Em di nav çiyayên bilind re diçin, diçin û dawiya dawîn niha em li dora golekê ne. Goleke mezin, mend û kûr…

Li ser golê hin şînkayî bi ber çavên me dikeve, erê erê, li nêzî peravê, tam beramberî me kulîlkên spî yên bi navê 'sosina avê' awirên me dihingêve.

Av mend e, pêlên wê carina li peravê dixin, tu dibêjî qey dê niha her tiştî li peravên xwe bixe lê ew sosin her li cihê xwe ye. Pêl vedikişin, tu dibêjî qey dê niha wê ber bi nava golê ve bibe û di nava xwe de winda bike.

Lê sosin her li cihê xwe ye. Di nava avê de, rawestiyaye û xweşik xweşik bi stêrkan re dibişire.

Rehên wê ji ku tên ne diyar e, lê wisa rawestiyaye tu dibêjî dê niha ber pêlekê bikeve û pê re biçe, lê di cihê xwe de 'çikiliyaye' naçe. Rawestiyaye; rawestîneke wisa ku tu dibêjî qey bi ser çûyînê ye. Tu dibêjî qey çavê wê li riya 'çûyînekê' ye, tu dibêjî qey dê bîskeke dîtir xwe bide riyekê û bi ber pêla bayekê bikeve û penîçav bibe, ji vî aliyê golê biçe aliyê dîtir, lê ew her û her rawestiyaye û li stêrkan temaşe dike.

Heke we ew sosin baş dîtibe niha jî li 'jiyanê' bifikirin, li haletî ruhiyeya xwe, çend dişibe wê rawestana wê sosinê ne wisa?

Ma ne, em jî di jiyanê de her dem welê ne tu dibê qey dê ber bi 'nediyariyekê ve bawanên xwe vedin û di asoyên wê de winda bibin' ma ne, em jî wisa ne, tu dibêjî qey niha pêlek an jî bayek li me bixe û em ê xwe di babelîsk an jî gerasîska wê de winda bikin û biçin û hey biçin!?

Ma ne, em wisa rawestiyane her wekî li ser çûyînekê bin û dê bîskeke dîtir xwe di wê 'nediyariyê' wer kin!?

Nizanim ka 'jiyan, rawestek li ser çûyînê ye an na' lê xuya ye ku hemû lêgerînên insanî yên jêr û jor, çep û rastê li mirovî bi xwe 'radiwestin' mirov çend 'biçe' û ber bi 'çûyînan' bibe, heta enerjiya negatîf ji nava xwe 'nebe' û di jiyanê de 'wateya hebûna xwe tênegihêje û neke haveynê bîr û boçûn û rabûn û rûniştina xwe' dê her dem aliyekî ruhê mirovî sar, aliyekî dilê mirovî tarî û aliyekî rawestiyana mirovî 'li ser çûyînê' be.

Belkî jî, berî ku mirov ber bi pêl-an jî bayekê ve xwe berde û pê re biçe, diviya mirov li xwe vegere û ber bi kûrahiyên hiş û dilê xwe biçe û ji hundir ve li xwe bigere û bi 'hebûn'a xwe ya spîrituel re bigihêje hev û xwe 'temam' bike.

Xweduristkirin, ew e ku mirov xwe ji derûniya wekî ya sosina ser avê xilas bike û –di jiyanê de- wekî çinareke li keviya jiyanê wisa rast û bi heybet raweste.

A girîng ew e ku mirov bi bîr û boçûnên xwe li ber pêlên jiyanê raweste û bi kesayeta xwe ya spîrituel re hevgirtinekê çêbike û bi vê rawesta xwe ya 'rast' bibe aktoreke çê di civakê de.

Bi hêviyên xweş Cejna Heciyan li we pîroz be!

www.arsivakurdi.org

Qerf Henek

Yildiz Gultekin
yildizgultekin@hotmail.com

Bûka li serê govendê -II-

Dema min derî vekir, hema bûkeke çavbelek xwarê bû destê min maçî kir. Min aha dêna xwe dayê, qet naşibe ew bûka li serê govendê. Yeke rû bi ken, bejn bilind, çavbelek, dev û diranê wê mircan, hema weke qîza eşîra xuya dikir, dema mirov lê mêze dikir, ew kenê li ser lêvên wê hema bêhna mirovan fireh dikir. Piştre, min di dilê xwe de got, heeeey Gulîzer te jî di ciwantiya xwe de xwe hildiavêt, tu çima der heqê vê keçika ciwan û bedew de xerab fikiriyî! Ev fikir ne rind in, vana li serê xwe bavêje, binêr ev keçika hanê çûye welatên mezin xwendiye û hemû der dîtiye, lê qet eslê xwe ji bîr nekiriye. Weleh min ji xwe şerm kir.

Ew bûka hanê çawa kete hundir, dev bi ken, te digot qey silavêrkek ketiye malê, wê deqê hurmeta me hemûyan girt, xoncek jî daae destê xwe, wê ew xonce vekir, her yek ji me re çend tişt aniye.

Gelo wê ev xoncana çawa hazir kirine! Porteqalê bi dengekî nizim got, "na lêê, vana gişt hazir standine, ew nikare vana hemûyan neqiş bike" min baweriya gotinên Porteqalê nekir, waye ev keçika ciwan çiqas dev bi ken e, ma daha tu çi dixwazî! Heta êvarê bû pile pila Porteqalê, hemû der û cînarê min hatin tijî malê bûn, wê bukê rabû çayek çêkir, bi destê xwe hevîr hasil kir, piştre jî bi wî hevîrî nanekî wisa vekir ku em şaş man.

Paşê min jê pirsî tu li ku derê elimiyî vana? Got we hew dizanî ez keçikek fehsekor im ne wisa ye! Lê ez jî qîza eşîra me, diya min deh heb qîz mezin kir, dema em mezin bûn jî diya me her tişt hînî me kir, wê her tim digot hûn dema çûne mala mêrê xwe bila kesek li we nekene, ji bo vê jî çi meziyet hene gerekê hûn biecibînin, me jî qet gotina diya xwe badilhewa nehişt. Belê min li welatê mezin xwendina xwe qedand, lê tu carê min esil û esasê xwe ji bîr nekir. Porteqalê bi heybet gote bûkê, lê çi halê te bû, tu wisa ketibû serê govendê, qet xema te nîn bû, hema te li serê govendê xwe li ba dikir!

Got ez benî, min destûr ji xwesî û xezûrê xwe standibû, ji bo vê jî ez rehet bûm, heke min hûn aciz kirin jî biborin, lê niha divê gerek ez herim waye tarî kete erdê. Min ew bi rê kir, ez vegeriyam Porteqalê, ji min re got keçê ev çi halê te ye! Binêr waye ev keçika ciwan li welatên xerîb xwendiye lê binêr qet esil û esasê xwe bîra nekiriye, hem jî heta tu bêjî jîr e jî, çima kêfa te jê re nehat ez nizanim! Porteqalê xwe da ser kêlekê, bi dengekî weke dexesiyê bike, got erê dayê ji xwe kîjan ciwan hurmeta te bigirin, tu wana diparêzî. Min zanîbu Porteqalê ji çi aciz bûye. Wê dixwest ku ez pesnê wê bidim, çend rojên din ez û Porteqalê çûn mala bûkê, min heta êvarê pesnê wê da, bûka delal jî li çavên min mêze dikir, di bin lêvan de dikeniya.Min û ew hevdu fêm kir, wekî din jî xema min nîne. Xwezî hemû bûk weke vê bûkê bikevin serê govendê.....



XAÇEPIRS

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1			■				■		
2					■				
3	■			■					■
4		■					■		
5					■			■	
6			■			■			■
7	■				■				
8		■						■	
9				■			■		

Ji çepê ber bi rastê ve

1. Dema mirov şîr bidoşe û dest nedê tebaqeya bi ser dikeve, qeymax... Awayê bangkirinê ya xwîşka mezin... Notayek **2.** Sureyek Quranê... Cureyekî kincên şer, ji metal an jî ji çerm dihat çêkirin **3.** Rêxistina polîsan a naziyan... Kesê ji dê an jî ji bavê mirovî **4.** Firaq... Pirç **5.** Bajarekî me... Dewara nêr **6.** Agir... Baneşana ku pê ga tê ajotin û sekinandin... Peyveke teşwîqkirinê **7.** Teref... Lehengê destana Newrozê **8.** Beşer, mirov **9.** Amûreke çandiniyê ya ku pê zad tê çinîn... Rojek... Ji bo bûkê, birayê zavê

Ji jorê ber bi jêrê ve

1. Rastkêşek... Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin... Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin **2.** Yekeya giraniyê ku li Fransayê 30,59 gr û li Îngilistanê jî 28,349 gr û li Holandayê jî 100 gr ye... Kurteya rêxistina rizgariya Îrlandayê **3.** Hêsan... Cihê ku çûk û teyr xwe lê datînin **4.** Cînavka pirhejmariyê ya xwerû... Hespa mê **5.** Tevgera hewayê... Notayek **6.** Darê şewatê yên hişk... Cihê ku maden û xwê jê tê derxistin **7.** Plakaya navneteweyî ya Îranê... Xwarinên ji şîr **8.** Afirandina şanoyê ya dilpêşewitîn û pêkenîn pêkve ye... Cînavka şexsê sêyemîn ji bo rewşa netewandî **9.** Baneşana kêfxweşiyê... Nexweşiyek... Xweliya piştî şewatê

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	S	O	L	■	A	Ş	Ê	F	■
2	A	■	O	F	■	E	L	A	F
3	Q	E	R	■	X	W	■	B	A
4	Î	■	Î	D	■	K	O	L	■
5	■	Î	■	Û	R	■	J	■	X
6	A	R	Î	■	E	D	E	N	E
7	D	O	■	E	S	A	■	A	■
8	I	■	E	B	E	D	Î	■	A
9	L	Î	W	A	N	■	Ş	E	Ş

Herdu nêçîrvan

Apê Bûbo û Apê Fexro dest bi nêçîrvaniyê kirine. Biryar dane ku ji segbanê segbanan Apê Cano hînî segbaniyê bibin, da ku fîşeka wan tu caran fût neçe.

Herduyan bi vê armancê berê xwe dane Meşkîna Lêf.

Apê Cano herdu mêvan li ser seran û ser çavan ezimandiye. Gotiye "ez jî êdî extiyar im, berî mirinekê dixwazim hinekan hînî segbaniyê bikim. Bila ev huner nemire." Kêfa Apê Bûbo û Fexro pir hatiye.

Rabûne bi hev re derketine nêçîrê. Li pala çiyayê Pozê Bîran Apê Cano gotiye "Ev kuna sivoriyê ye, niha dê bazde." Bi rastî jî sivoriyekê baz daye, berdanê kuştine.

Piştî demekê kunek mezintir dîtine, Apê Cano dîsa gotiye: "Ev kuna rovî ye, dê niha bazde." Gotina wî dîsa rast derketiye û roviyê min û te li erdê pîja pîja bûye, hatiye kuştin.

Apê Bûbo û Fexro pir westiyane û gotine "Apê Cano bes e, em betilîn. Êdî em dikarin nêçîrvaniyeke baş bikin. Mala te ava" û xwe berdane Dêrika Çiyayê Mazî.

Piştî demekê gundê mala herduyan li gundê Menteşiya Jêrîn hatiye şewitandin. Dewletê herdu ji gund derxistine. Herduyan bar kirine çûne rojava. Rojekê herdu bi hev re derketine nêçîrê. Ev çiya û ew perpal, ev newal û ew masûlk meşiyane. Rastî kunek mezin hatine. Herdu ketine devê kunê û li hêviya nêçîra xwe mane.

Roja din di rojnameyan de nûçeyek wiha derketiye.

"Trên li du nêçîrvanan qelibî, herdu jî nefilitîn."

Çavkanî: Amida kurd

Xweda me ji kerîtiyê xelas bike

Sê ker li ber siya dîwarekî ne. Kerek ji wan dibêje:

- Birayên ker, ez dixwazim tiştek ji we re bêjim.

Her du kerên din:

- Çi ye?

- Eger hûn ji min re bêjin amîn, ez ê duayekê bikim.

- Ê ka dua bike, em binêrin.

- Ya rebî tu ruhê xwediyê min bistînî ez jê xelas bibim.

- Her du kerên din:

- Çima?

- Ê heyran heta êvarê palanekê li min dike, palan heye 80 kîlo. 8 olçek jî genim li min dike û bi xwe jî li ser min siwar dibe. Ruhê min derdikeve heya êvarê.

Kerê din:

- Welle dîsa yê te rehet e, yê min zehmetir . Yê min îcar palanê min kevin e. Ew dar û mar û hesinên wî hemû di pişta min de diçin. Pişta min tev cedewî bûye, birîn bûye, tev bûye kunêr. Bi ser de jî dema em bi rê ve diçin, ez ji xwe bi zor dimeşim, xwediyê min ji pare bi daran gurm û gurm li min dide, min dipelixîne.

Kerê sisiyan:

- Ez jî dikarim tiştek bêjim?

Kerên din:

- De ka tu jî ya xwe bêje.

- Werin dev ji van tiştan berdin. Werin em bi hev re ji Xweda re dua bikin, bira Xweda me ji vê kerîtiyê xilas bike.

www.aksiyakurdi.com

Çend xewn û mayînek

SALIH DEMICER

Tiliyên xweristê bi rengekî diyar û aşkera bi zeviyên deşta Sirûcê dilîzin, şan û behreya her demsalekê bi awakî cuda ji rûyê deştê dikelin, bi nerîneke kurt û ji dûr ve, lê taybetiya demsalê tê naskirin.

Her wekî parvekirina xwedê ji hiş û mejî re, ji girsbûn û hûrbûna laşê mirov re, ji saxî û nexweşiyê re, bi taxim û sînorên berz di navbera zeviyan de, parvekirin xwe rût û tazî şanî mirov dike.

Xêzin bi paniya nîvgavekê zeviyan ji hevûdu vediqetînin, û cureyên çandiniyê li gor wan xêzan her zeviyekê bi kirasekî taybet dike.

Lê ku mirov xweş meyzeke ewe xêzeke ji hemî xêzan berztir û diyartir ku deştê di nîvî re dike du par bibîne, xêzeke ku nasnameya deştê dike dudu, sîngê wê diçirîne û ser û binê wê ji hev cuda dike, xêzeke bi paniya du gavan deşta Sirûcê dike du welatan.

Ew xêza rêça trênekê ye, bermaya dagîrierinêbiyanî di herêmê ê de ye.

Gedro yek ji wan cotkarên ku temenê xwe tev li nav zeviyên deşta Sirûcê derbas kiribû, tevî ku buhustek ji wan zeviyan ne ya wî bû, lê tê de dixebitî wek ku tev de yê wî bin û bêhtir.

Roja ku bêkar dima nizanîbû bi çi awayî valahiya xwe bikuje, pir caran bi şev radibû û diçû nav pembûyê xwe, ta demeke dereng ji şevê li wir dima, dostiyeke bê hempa bi Axê re ava kiribû, tevî ku nexwendibû, lê ew wek zaniyarekî li ser şîrînbûn û nirxdariya wê dipeyivî, ew û Zeyno her roj di dema firavînê de li bin siya dara Tûyê rûdiniştin, ev dara ku îsal ketibû şûna konê wanî ku salê li aliyekî Deştê dihate vegirtin.

Roja duşemê:

- Ger tu zanibe çawa bi axê re bide û bistîne, ew wek dost û hogirekî bê ziyane, piştvan û xwîşka rojên teng û tunebûnê ye, jêdera hemî sedemên jiyanê ye, tu li rûyê wê gulan biçîne ew ê ji te re gulistanekê li darxe, lê eger tu guleyan biçîne bêguman ew ê bibe mezel û goristan.

Ax jî wek mirovekî dilsoz e, bi qasî tu pêde ewê bide te û bi guhnedana te lê, diçilmise, ditengire, bêzar dibe, lê ew naşikê, ne bi tîn û elawiya havînê û ne jî bi sar û serma zivistanê, her dimîne wek xwe, nayê guhertin.

Destê xwe bi aliyê Sînor ve dirêj dikir:

- Ha va ne, di bin çengê me de maniyan diçînin, tu zane salê çend bêgunehan dikujin bi behaneya parastina sînor... Xwedê me ji van bêbavan biparêze.

Roja çarşemê :

- Tê bîra te Zeyno, me wê salê dîsa pembû li vir çandibû, çi berê xwe xweş bû!!, me sê ber dane hev hîn jî qozikan eşqin dida, tê bîra te kete sar û serman, ji tirsa ku dîsa li pê me sipî bibe me dewar berdayê.

- Wê salê me odeya xwe ya başûr lêkiriu.

- Bi ya xwedê wê îsal jî bi ber be, vaye tîrmeh gihîşt dawiyê û hîn ava me kêm nebûye, tê serê min ez odeyeke din ji zarokan re avabikim.

- Odeya çi, halê çi, ma te xwendina Lewend ji bîr kir Gedro, ne îsal ji pêre wê here Helebê nizanim li ku derê bixwîne. bi xwedêkî navê wê çiye...

- Zanîngehe Zeyno ma ev bû çend car tu dipirsî...

- Xwedê Xêr pê kirê, ma xwendin li parêzgehê bi gotinaye, tu dibîne em li vir nikarine xwe bi ber wî dine,her hefteyekê bi kêmanî sed dirav jêre divê , sibe li Helebê ka pênc sed dirav jêre gereg bin, hîn bêhtir mirov nizane.

- Gedro tu ji ku tînî nizam, ez nahêlim Lewend wek zarokên Birayê te bibe, tu nabîne ew çiqas sergiran û eyarqalindin, li tu deverê natebitin, birayê te rojê tîmarekê dide wan, na bi xwedê eger em çekên bifroşin emê wî bişînin Zengenê.

- Keçê Zanîngeh e, Zanîngeh.

- Looo, tu çi çînikan ji tiştan derdixî...de zanebûna min eve.

- Ez dibêm bi a xwedê ez nahêlim ew ji xwendinê bi dûr keve, ez wî wek xwe nakim, min temenê Xwe tev de li ber bêrê derbas kir, ka min çi bi ser xist..

Roja pêncşemê

- Erê.... erê Xwedê Wan rojan bibe û venegerîne, pir caran me xwe li deriyan digirt ji bo kirêya odeya Lewend li bajêr, em her roj bi ser xwede dernexûn dibûn .....

- Ê ma niha rewşa me pir xweşe.! ka me çi bi ser xistiye, li xelkê biner, giş bi cil û cêrazxin, bi serşok û kulikê Ifrencî ne, li ber her malekê Textek hesinî bi çar cihan heye.

- Keçê dîsa başe, pereyên kesî li me tunene, xaniyê me çê xerab hene, û vaye me Lewend gihand vê radeyê Ji xwendinê, dîsa rinde, ma kê bawer dikir ku em ji wê tengasiyê rizgarbin divê em rojê deh caran destê xwe ramûsin û bi ser serê xwe din.

- Rewşa mirov hinekî bi dest wiye jî, ma pere çiye, mirov dikare perê salekê di rojekê de bavêje, a niha yê te, li nik te diravek û hezar dirav wek hevin, ez tim ji tere dibêjim Gedro hinekî destê xwe bigre, lawo em bi kevçiyan kom dikin tu bi heskê bela dikî.

- Keçê ma min çi kiriye, min tenê duh çend heb Hêjîr kirîn te ew jî di ber mede kirin jehr.

- Lawo xweziya Hejîr tenê bana, her ku tu diçî bajêr tu Hejîran tînî, Tirî tînî, Xurman tînî, Titûnê tînî, tu ji ser çi dadigerî ez nizanim.. berê du kirasên te hene, tu dibê min dil heye ez yekî din bidrûm, ka ji min re bêje emê çawa peran bi hev din.

- Ma min çû kirî. a min di ber dilê xwere anî, ez zanim ne dema kirasane, bila bimîne zivistanê, ez û te emê rojekê herin bajêr, ezê Kirasekî ji tere û yekî ji xwe re bikirim.

- Na na.. ez kiras mirasan naxwazim, niha xwendina Lewend ji her tiştî pêwîstire, ev kirasê min hîn du salên din li min dibe.

Roja Şemiyê

Roja şemiyê serê sibê, hîn tîrêjên rojê xwe bernedabûn sîngê Deşta Sirûcê, gundên nêzîk ji pembûyê Gedro ve bi dengê teqîna Manyînekê Ji xew şiyar bûn.

Piştî nimêja sibê û li heman cihê ku wî û Zeyno hêvî û omîdên ji bo pêşxistina rewşa xwe diristin, xewna xwe ya ku Lewend bibînin bervedêrekî bi nav û deng, dîtina berê pembûyê îsal piştî mehekê, bi destxistina piskilêtekî ji Ronî re ku ev sala sisiyan bû dihate ragirtin, avakirina serşokeke serbixwe, kirîna çêlekekê ji bo şîr û mastê Rojane û hîn pir xewnên din, giş bi belavbûna perçeyên laşê wî re belav bûn.

Kevlîjanik*

1. bi çavekî

tenha
bi çavekî ez jiyanî
temaşe dikim
(çavê min yê dîtir ji cam e)

bi çavê xwe yê tekê
ez qenc dibînim
û... bi yê dîtir
hîn û hîn bêhtir
lew...
bi çavê xwe yê vekirî
ez ber xwe dibînim
û... bi çavê xwe yê kor
tim xewnedar im (1963)

2. yê bi lingekî

lingek min nîn e...
her wiha
ji dêvla du lingên we
sê lingên min hene

bi du lingên xwe...
ev ên li cem we ne peyda ne
û... hûn bi xweşkayî
nav lê dikin
bi van her duyan
ez tim û tim
kenarê rêkan
bi xal û nîşandekan dineqişînim

ta çîroka jiyana mirovatiyê
bi hêsanî bête xwendin
û... ev kenare rêk hêjayî
xwendinê bin

û... bi lingê xwe yê sêyem
ev ê ku bûye sedema
ku hûn navê min bikin yê bi lingekî
bi vî lingî
ez li nanê jiyana xwe digerim

ligel vê yekê...
hûn tim mijûl in bi hilbijartina
du cot pêlav bo her du lingên xwe
ma hûn ji min nadexisin ??
(1963)

3. qeşmer

barove...
li ku dijî... ??
di koşkan de
û di firnikên bêvilê me de jî

bêdengî
li ku dimire ...
di pend û şîretan de
û... di guhê me yên zextekêş de jî

xwîna me ya germ...
li ku tête dîtin ??
di bin neynûkên dujminên me yên kevnar de
ew neynûkên
ku pêwîstdarê meqesekî ne

kevnepeyker
li ku dimirin...
di bin giraniya çepk û çangan de
û... di dûkela bixûrê de jî

hêzdariya hişê me li ku ye...
ne tenê di serê me de ye
belê di birînên me de jî dihêwire

kanî xelasiya me ..
ya me...???
ax...
hey hewar
ew ne di dest me de ye (1962)

BARUYR SÊVAG
Ji ermenî: Zara Delibro

***Rûpoş**

Mirov heta roja teng dostê xwe nas nake

EBDUREHÎMÊ MÛŞÎ

Carek ji cara rehmet li dê û bavê hazir û guhdara: Hebû tunebû camêrek hebû. Camêr êdî extiyar dibe. Rojekê dibêje ez îro hinekî kurê xwe şîret bikim, dibe ku ez bimirim rojekê kurê min bikeve tengasiyê, nizanibe cilê xwe ji avê derxîne.

Camêr ji kurê xwe re dibêje kurê min baweriya xwe bi kesî neyne û bi kesî nexape, eger ku ez mirim, nîvdostekî min heye, eger ku rojekê li te teng hat, tu xwe bavêje ber bextê wî.

Kurê wî pê dikene û jê re dibêje bavo tu dibêjî nîvdostekî min heye, lê ê min bi dehan dost hene.

Camêr dike û nake kurê xwe îqna neke. Ji kurê xwe re dibêje mafir ko wisa ye, em hemû dostê xwe bi ceribînin. Ka dostê me yê roja teng kî ye?

Kurê wî dibêje ser çavan bavo.

Ji kurê xwe re dibêje here Beranê me bîne, em serjê bikin têxin Qelî. Kurê wî diçe Beran tîne. Vana Beran serjê dikin, Goştê Beran dikin Qelî. Qelî yê dikin hundurê Têrê, davên ser pişta Hespê xwe û bi şev diçin derê dostê kurê xwe yek biyek, li derê kî dixînin. Dema ku derî vedikin.

Dibêjin we vê şeva hanê xêr e???!!!

Vana dibêjin belakî bi ser me da hat, Xwedê bi serê kesî da neyne, me mêrekî kuştî ye vayê di hundurê Têrê da li ser pişta Hespê ye, tu xêra xwe veşêre û me jî bihewîne.

Vana yek bi yek dibêjin bi Xwedê em we nahewînin, hûn ji kuderê hatine dîsa herin wir!!!...

Ez çi serê we bihêşînim; werhasilê kelam camêr û kurê xwe temamê dostên kurê xwe di ceribînin yek vana nahewînin.

Camêr ji kurê xwe re dibêje kurê min ew dostên te yên ku tu pê bawer bû, te ew dîtin. Kurê wî dibêje belê bavo.

Îcar camêr ji kurê xwe re dibêje, em herin cem nîv dostê min. Vana diçin li derê camêr dixin.

Viya derî vedike, li kêf û halê hevdû dipirsin. Wer hasil ez dirêj nekim.

Camêr dibêje vê şeva hanê we xêr e înşelah?

Vana dibêjin hal û mesela me ev e, me mêrekî kuştî ye, me xwe li Xwedê girtî ye, li te girtî ye, tu vî cinazeyî di Baxçe yê xwe de têxe binê erdê veşêre, bila kes pê nehese.

Camêr dibêje hûn rast dibêjin?

Vana dibêjin belê.

Camêr vana digre hundur û wê şevê vana di Baxçe yê wî de erdê dikolin û wî Qelîyê dixin binê erdê û vana vedigerin tên mala xwe.

Roja dinê serê sibe yê e camêr ji kurê xwe re dibêje; ka em îcar dostê xwe bi ceribînin Dostê Me fîre dide an jî na. Viya ji kurê xwe re dibêje tu rabe here mala wî dostê min, li ber wî bi sekine hetanî Xwedê quwetê dide te tu şîmaqekî li binê guhê wî bixîne, jê re bibêje bavê min gotiye bila wî cinazeyî ji Baxçe yê xwe derbixîne, ji min re bişîne. Ka hela çi bersiva te dide.

Viya diçe, li ber camêr disekine û şîmaqekî li binê guhê camêr dixîne, dibêje bavê min gotiye bila wî cinazeyî ji Baxçe yê xwe derbixîne û ji min re bişîne.

Camêr dibêje kurê min here ji bavê xwe re bibêje, camêr gotiye, ez Baxçe yê xwe ji bona şîmaqekî bavê te xerab nakim. Viya vedigere tê; ji bavê xwe re dibêje hal û mesela min û Dostê te ev e.

Viya ji kurê xwe re dibêje kurê min: Min Dostê xwe nîv Dost dizanîbû, lê dostê min rast û bibext derket. Dostên te jî hemû sexte û derewîn derketin, dibêje kurê min, min ji te re negot kesî ji xwe re dost nizanibe û bi kesî nexape...

Camêr û kurê xwe cardin hevdû digrin tên mala dostê xwe: Jê re dibêjin hal û meselê min û kurê min ev in. Ew ne cinaze ye, me ji bona tespît kirina Dostê rast û qelp wisa kir. Vana cardin Baxçe dikolin, wî Qeliyê dertînin, didin Dostê xwe û tên mala xwe.

Serhed.org
Çîrok: Gelêrî
Komkirin: Çîrokbêj Ebdurehîmê Mûşê

ROJEV
26 Mijdar 2009 Hejmar: 14 Sal: 1 E-mail: awelat2002@yahoo.com



'Spor ruhê aştî û biratiyê ye'

Kluba Dîskîsporê bi kongreya xwe ya awarte peywira Îhsan Ugur dewrê parêzer Metîn Klavuz kir. Îhsan Ugur ev 6 sal bû serokê kluba Dîskîsporê bû. Hate hînbûn ku dê bi rêveberiya nû re ewil konferansa sporê pêk bînin.

Kongreya Awarte ya Kluba Dîskîsporê li Sînemeya Cep a Burhan Karadenîz ya şaredariya Mezin pêk hat. Şaredarê Bajarê Mezin a Amedê Osman Baydemîr, serokê DTP'a Amedê Firat Anli, Şaredarê Yenîşehîrê Selîm Kurbanoglu, serokê DTP'a navçeya Yenîşehîrê Bakî Karadenîz, Midûrê Navendê yê Spora Ciwanan Îslam Çetîn, serokê ASKF'ê Remzî Dayan, serokê Kluba Diyarbakirsporê Çetin Sumer, endamên lijneya rêveberî û delegeyên Dîskîsporê tevli kongreyê bûn.

Serokê dîwanê Semat Karakşa bû. Kongre bi deqeyek rêzgirtinê dest pê kir. Piştî vê Ekrem Yeşîl rapora xebatê pêşkêş kir. Ekrem Yeşil di pêşkêşkirina raporê de wiha got:

"Me di 6 branşan de bi 22 tîm û 600 gogbazî re xebatên sportîf, perwerde û aktîvîteyên civakî pêk anîn. Tu tişt qasî sporê bandorê li ser civakê nake. Spor li cîhanê bûye wekî zimanekî gerdûnî.

Me li parkan, dersxaneyan gelek xebatên sportîf dane meşandin. Em li Sumerpartê jî vê xebatê didin meşandin. Ya herî girîng jî ev e ku di her temenî de welatiyên me tên vir û sporê dikin. Di mehên havînê de me Dibistanên Havînê yên Sporê vekirin. Klub ligel kêmasiyan hate parastin. Ez li vir spasiyên xwe ji bo alîgir, camîaya sporê û şareder Osman Baydemîr pêşkêş dikim.

Nûnerên Amedê yê Tekvandoyê Fatîf Hîllez jî axivî û diyar kir ku divê DÎSKÎspor zêdetir xwedî li gogbazên xwe derkeve û wiha got:

"Gogbazên ku li vir xwe digihînin li Îzmîr, Stenbol û Enqereyê li ser navê Şaredariya Bajarê Mezin derdikevin sahayê."

Piştî xwendina raporê di rêziknameyê de di xala 12'emîn de hin guhertin pêk hatin. Di rêziknameyê de wiha tê gotin:

"Endamên lijneya rêveberiyê ku berê 7 esil û 7 yedek bûn wekî 9 esil û 9 yedek hate guhertin.

Serokê Klubê Îhsan Ugur axivî û wiha got: "Min peywira serokatiyê dewr kir. Ev 6 sal bûn ez peywirdar bûm. Me dem bi dem zehmetî kişand. Di demên herî teng da me birêz Baydemîr li cem xwe didît. Spor ji bo aştî û biratiyê ye. Em tu carî ji vê esasê paşve neçûn."

Dîskîsporê kongreya xwe ya awarte li Sînemaya Cep a Burhan Karadenîz pêk anî. Di kongreyê de rêveberiya klubê ya nû hate aşkerakirin û her wiha bo serokatiyê kulubê jî Parêzer Metîn Klavuz hate hilbijartin

'Divê tesîsa sporê temam be'

Serokê DTP'a Amedê Firat Anli jî mafê axaftinê girt û spasiya xwe pêşkêşî Îhsan Ugur kir. Anli wiha dirêjî da axaftina xwe: "Spor ruhê aştî û biratiyê ye. Divê hemû gogbazên me li ser vê esasê derkevin sahayê. Tesîsa ku li ser riya Mêrdînê tê çêkirin jî divê di demeke nêz de biqede. Divê zarokên me li wir sporê bikin."

Baydemîr: Amed ekol e

Şaredarê Bajarê Mezin a Amedê Osman Baydemîr axivî û wiha got:

"Hemû welatiyên vî bajarî jiyaneke xweş û kêfxweşiyê heq dike. Spor beriya her tiştî aştiye. Bi taybetî li Tirkiyeyê spor her diçe bi hestên negatîf tê nîşandan. Em vê yekê qebûl nakin. Em ê vê yekê bi terzeke aştiyane nîşan bikin. Amed di vî warî de ekol e.

Ji ber vê jî em vê kongreyê gelek girîng dibînin."

Rêveberiya Dîskîsporê ya nû;

Rêveberiya esil: Parêzer Metîn Kilavuz, Prof Dr Adnan Suay, Murat Kaçar, M. Cemal Dogrul, Haci Haspolat, Murat Tugrul, Abîdîn Kakdaş, Nalan Bozhan Ekrem Yeşîl.

Rêveberiya yêdek: Mîmar Ramazan Karaşîn, Zulkuf Ak, mîmar Abdullah Sevînç, Cahît Baran, Bişar Îçlî, Zehra Buylaktluyurga, Îbrahîm Demîr, Abdurrahîm Sertbaş, Îbrahîm Dengîz. **AMED**

Turnuvaya Cemiyeta Rojnamegeran bi dawî bû

Turnuvaya Futbolê ya Hali Sahayê ku ji hêla Cemiyeta Rojnamegerên Başûrê Rojhilat (GGC) û Şaredariya Kayapinarê hatibû lidarxistin, bi lîstina maça finalê ya Egîtîm-Sen û Kuyumcularsporê bi dawî bû.

36 tîm tevli Turnuvaya Hali Sahayê bûn. Di 16-23'ê mijdarê de li Tesîsên Sporê hate lîstin. Maça finalê di navbera Egîtîm-Sen û Kuyumcularsporê de hat lîstin. Egîtîm-Sen 3-2 bi ser ket û di turnuvayê de bû yekem. Kuyumcularspor bû duyem û Habersen jî bû sêyemîn. Bi merasîmekê kupa û plaketên wan hatin dayîn.

Serokê Cemiyeta Rojnamegerên Başûrê Rojhilat (GGC) Faruk Balikçi got, armanca musabeqayên ev e ku di navbera saziyên sivîl de yekitî û piştevaniyê pêş bixin.

Şaredarê Kayapinarê Zulkuf Karatekîn jî di merasîmê de axivî û got, di maçan de tîm li gorî ruhê futbolê tevgeriyane. Karatekîn wiha domand: "Bajar çiqas mezin dibin, di navbera mirovan de têkilî evqas qut dibin. Armanceke vê turnuvayê jî di navbera mirovan de derfetê têkilîdayînê ye."

Piştî axaftinan, kupaya Haber-Senê ji hêla Serokê Kluba Sporê ya Şaredariya Kayapinarê Mahmut Dag ve, ya Kuyumcularsporê ji hêla Serokê GGC'ê Faruk Balikçi ve, ya Egîtîm-Senê jî ji hêla Şaredarê Kayapinarê Zulkuf Karatekîn ve hatin dayîn. **AMED**

Li cîhanê 33 milyon AIDS'î hene

Ji aliyê Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) û Komîsyona AIDS'ê ya Neteweyên Yekbûyî ve (UNAIDS) raporek hate weşandin. Li gorî raporê derket holê ku li cîhanê 33,4 mîlyon kes bi nexweşiya AIDS'ê ketine. Di rapora ku hate weşandin de hate destnîşankirin ku 2 mîlyon kes li sahraya Afrîkayê ji nexweşiya AIDS'ê mirine û di sala 2008'an de jî nêzî 2,7 mîlyon kes bi vê nexweşiyê ketine.

Li gorî rapora hevpar a WHO û UNAIDS'ê di navbera salên 2001 û 2008'an de hejmara nexweşiya AIDS'ê balê dikişîne. Li gorî vê raporê ev nexweşî ji sedî 17 kêm bûye. Ev ast li welatên başûrê Afrîkayê ji sedî 15, li Asyaya rojhilat ji sedî 25 û welatên Asyaya başûrê rojhilat jî ji sedî 10 kêm bûye. **CENEVRE**

Ev sewal matmayî dihêle

Li bajarê Chelyabinskê ya Rûsyayê sewaleke ku heta niha nehatiye dîtin hate kifşkirin.

Hate diyarkirin ku giyanwer di qadeke înşaetê de hatiye dîtin. Giyanwer di rojeva Rûsyayê de bû mijara sereke.

Tê texmînkirin ku giyanwer yek ji giyanwera berî dîrokî di pêşketina peresan de derketiye holê. Giyanwer ji bo lêkolînê birin labaratuarê. **MOSKOW**



Pira Bagivar vebû

Ji bo alternatîfa pira dîrokî ya Dehderî, pira Bagivar hatibû çêkirin. Pira Bagivar duh hate vekirin.

Pira Dehderî ya Dîrokî ku 1500 saliye li trafîkê hatibû girtin. Ji ber vê yekê ji bo alternatîfa wê hebe Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê projeya pirê amade kir.

Pira Bagivar di 30 hefteyî de hate temamkirin û kete xizmeta gel.

206 metre ye

Kîlometreyekê ji Pira Dehderî dûr e. Dirêjiya wê 206 metre ye û firehiya wê jî 13.25 metre ye. Pir ji deh deriyan pêk tê. Nêzî 3 mîlyon 500 hezar lîra li Pira Bagivar çû.

Hemû xizmetên mîmarî û endezyarî ji aliyê endezar û mîmarên şaredariya Bajarê Mezin ve hatin kirin. Pir bi tevlibûna gel hate vekirin. **AMED**

www.arsivakurdi.org